Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî   Jimar :1329   30-Mijdar-2025   www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Navenda Şîfajin; Cihê ewlehî û şîfayê ji bo jinan

**Hêvî Keleş/ Jinwar**

**Li gundê Jinwar, Navenda Şîfajin cihek ewle û saxlem ava dike ku ji ezmûn û hevkariya jinan derdikeve, dermanê kevneşopî û xwezayî bi hev re dike yek û lênihêrîna berfireh peyda dike ku piştgiriyê dide tenduristiya jinan û serxwebûna wan di civatek xweser û yekgirtî pêş dixe.**

Navenda Şîfajin li dilê gundê femînîst Jinwarê ye, ku jin hewl didin jiyanek li ser bingeha xweserî û hevgirtinê ava bikin, wekî yek ji girîngtirîn projeyên tenduristî û civakî yên ji bo jinan tê veqetandin derdikeve pêş. Navend xizmetên bijîşkî yên li ser bingeha pisporiya femînîst pêşkêş dike û armanc dike ku jinan hem ji hêla tenduristî û hem jî ji hêla rewşenbîrî ve di hawîrdorek ewle û bê tundûtûjî de bihêz bike.

Navenda şîfa û tenduristiyê ya ŞîfaJin (Şifakirina Jinan) di 4'ê Adara 2020"an de li Jinwarê vebû. Ji bilî odeyên ji bo dermankirin, şêwirmendiyê, xebatên perwerdehiyê û hilberîna dermanên xwezayî, projeyê baxçeyek ku giyayên derman lê têne çandin û her weha ambulansek jî dihewîne. Jinên ji Jinwar û gundên derdorê li ŞîfaJinê bi armanca berhevkirin û vejandina zanîna şîfaya xwezayî ya kevneşopî û hevberkirina wê bi zanîn û rêbazên dermankirinê yên nûjen re bi hev re dixebitin. Me di rojên pêşîn de girîngiya vê nêzîkatiyê dît: Dema ku pandemiya koronavirusê li çaraliyê cîhanê belav dibû û gelek nexweşxaneyên li herêma me ji ber nebûna vebijarkên dermankirinê girtî bûn, Şîfajinê deriyên xwe ji bo civakê vekir da ku bi taybetî jin û zarokan derman bike û perwerde bike. Di çend mehên pêşîn de, zêdetirî 2 hezar jin û zarok ji gundên derdorê hatin ŞifaJinê ji ber ku ew dikarin li vir piştgirî û çareseriyan ji bo pirsgirêkên xwe bibînin.



### Şîfajin ji bo pêşxistina dermanên xwezayî projeyan pêş dixe

Navend ji bo dabînkirina xizmetên bijîşkî ji bo jin û zarokan, bêyî ti astengiyên civakî yên ku dibe ku rê li ber jinan bigirin ji bo dermankirina guncaw, hatiye damezrandin. Navend bijîşk, pîrik û jin ên jêhatî dixebitîne, ev yek dihêle ku jin bêyî şerm û tirs bi azadî li ser pirsgirêkên tenduristiya xwe biaxivin. Şîfajin li ser bingeha têkelkirina dermanên kevneşopî û xwezayî ye, ku jinên karker amadekariyên giyayî û melhemên dermanî yên ji nebatan herêmî têne derxistin amade dikin.

### Tendurustî wekî beşek ji projeya Jiyanê li Jinwar

Navend ji felsefeya gundekî ku bi tevahî ji hêla jinan ve tê birêvebirin nayê veqetandin. Şîfajin kursên hişmendiyê li ser tenduristiya hilberandinê, pêşîlêgirtina nexweşiyan, zayîna xwezayî û tenduristiya derûnî pêşkêş dike. Jin her wiha beşdarî atolyeyên perwerdehiyê yên ku dermanên giyayî û girîngiya zanîna tenduristiyê di avakirina serxwebûna jinan de vedihewînin dibin. Tîma bijîşkî bawer dike ku armanca wan ne tenê bi dermankirinê ve sînordar e, lê belê ew e ku têkiliya jinê bi tenduristiya xwe re ji nû ve pênase bike û baweriya wê bi xwe dûr bixe ji girêdayîbûna bijîşkî ku demek dirêj e bijarteyên jinan li civakên gundan sînordar kiriye.

### Cihê şîfa û zanînê li Jinwarê

Navend pêşwaziya jinên ji Jinwar û gundên cîran dike, xizmetên belaş an erzan pêşkêşî wan dike û ji bo gelek jinên ku li lênêrîna tenduristiyê ya ewle digerin, ew dike cihekî girîng. Ji bilî aliyê bijîşkî, navend rûniştinên piştgiriya psîkolojîk ên takekesî û komî pêşkêş dike ku alîkariya jinên ku ezmûnên dijwar an şîdeta navmalî derbas kirine dike da ku ji travmayê derbas bibin û hevsengiyê ji nû ve bi dest bixin.

### Pêşketina berdewam tevî zehmetiyan

Şîfajin bi saya hewildanên xwebexş û piştgirên xwe, yên ku bi berdewamî hewl didin klînîkê pêş bixin û bi alavên bijîşkî ve girêbidin, ji rewşa aborî ya dijwar derbas dibe. Rêveberiya navendê plan dike ku beşên nû ji bo fîzyoterapî û tenduristiya zarokan veke û xebata xwe di dermanê alternatîf de berfireh bike da ku hewcedariyên zêde bibin bicîh bîne. Navenda Şîfajin îspat kiriye ku jin dikarin modelek tenduristiyê ya li ser bingeha zanîn, hevgirtin û baweriyê ava bikin. Li Jinwar, lênêrîna tenduristiyê dibe kiryarek berxwedan û biryardariyê û cîhek ku jin mafê xwe yê dermankirin, rûmet û jiyanek aram lê vedigerînin.

## Gotina Dawî



### Tofana guhertina Nexşeyê nêze!

**Mihemed Seydi**

Derdê dewleta Tirk hemû ew e ku Kurdan li Rojavayê Kurdistanê bikin hêsîrê bin destê Daiş'ê û cihadîstên û çeteyên girêdayî xwe. Lewma di hergotinên xwe de li pêşî û li dawî banga danîna çekan li QSD'ê dikin. Lê gelo Kurdan çima çek hilgirtine da ku deyînen? Ji bo xwe ji çeteyên ku dewleta Tirk di destpêka aloziya Sûriyê de ava kiribûn biparêzin, Kurdan çek rakirin û ketin nava şer. Ji Cerebrûs û Girê Sipî van koman di sêrî de Cubhet El-Nussra êrişî Kurdan kir. Paşê ji ber nekarîn, vê carê Daiş dan pêş û texmîn dikirin ew ê bi tirsa ku Musil û Reqa kontrol kirin, ew ê cihên Kurdan jî bixin destê xwe, . Berovajî hesabên wan, hêza Kurdan mezintir bû û ereb û Asur û Ermen jî xistin nava xwe û çekên wan zêdetir bûn. Îro li bakur û Rojhilatê Sûriyê hêzekin û bi hezaran girtiyên DAIŞ'ê jî di destê wan de ne. Herwiha bi hezaran malbatên van DAIŞ'iyan jî di Kampên weke Holê de ne û herkes tîne ziman ka çawa wekî bombeyeke Pîm kişandiye û kengî biteqe nexuyaye. Li aliyê din, hîne jî tevgera DAIŞ'ê li herêmên Sûriyê bi tevahî dewam dike û yên şerê wê dike, tenê QSD'ê ye ku hevkarê Koalisyona Navdewletî ye. Di van şertûmercên heyî de, ew ê çima çek werin danîn? Ya din, ger werin danîn ew ê kî van çekan rabike?

Derbarê mijara çekên Kurdan li Rojavayê Kurdistanê de, di 24'ê Mijdarê de, dema şandeya Komisyona ji bo pêvajoyê diçin Îmraliyê, dîsa ji Rêber Ocalan pirsa çekdanînê dikin. Li gorî Endama şandeyê Gulistan Kilinç, Ocalan ev mijar bi avabûna sîstemeke demokratîk û hiquqî ve girêdaye û gotiye ku ger yên niha li Şamê dixwazin Şerieta Îslamî bi cih bînin, ew ê ber bi diktatoriyê ve biçin û ev jî çareseriyê çênake. Yanî, ya Ocalan dixwaze bighîne ew e ku ger sîstem hemû aliyan negre nava xwe û bibe diktatoriya bi kirasê Şerîetê, ew ê DAIŞ be û herkesî dît DAIŞ'ê li Şengalê û Kobanê çi komkujî pêk anîn.

Herwiha li ser pêvajoya ku li Tirkiyê jî dimeşe, li ser erdê tu gavên cidî heta niha ji aliyê dewletê ve nehatine avêtin. Meqsed di warê destûr û yasayan de tu guhertin tune. Herçiqasî hin alî di nava dewletê de hene ku naxwazin ev pêvajo bighêje serî û lewma mijaran bi niyeta ka belkî nebe, bi rojan dixin û dereng dihêlin, hin dengên ku hişyariyê didin da pêvajo bi lez bimeşe jî derdikevin pêş. Serokê Partiya Riya Nû Ehmed Dawutoglu di hefteya derbasbûyî de li pêşiya koma partiya xwe qale siyaseta dewletê ya derve û hin kir û bi zelalî got: "Li Rojhilata Navîn nexşe diguherin û divê Tirkiye ji bo pêvajoya çareseriyê bilezîne û pêngavên yasayî biavêje û hemû girtiyên siyasî werin berdan." Dema em bala xwe bidin tevgerên Dawudoglu, axivtinên wî yên derbarê Dewlet Bahçelî de û serdanên wî yên li Silêmaniyê û herî dawî Dihukê, em ê bibînin ku ew wekî berdestekî Bahçelî ji bo vê mijara Kurd û Tirk li hev werin dixebite. Ku ew berê jî di dema pêvajoya danûstandinê yê 2013'an de jî wezîrê karê derve bû û wekî zilamê bi siyaseta nerm dihat naskirin.

Dawiyê de dixwazim bibêjim ku ger niyeta dewleta Tirk tecrîdkirina Kurdan ji çekên wan be, bila ji xwe re li deriyekî din bixe. Ji ber Kurd çekên xwe radestî celadên xwe nakin û heta gefa qirkirinê li ser Kurdan hebe, ew ê berovajî çekdanînê, hîne çekên xwe û hêza xwe zêdetir bikin. Lê ger rastî jî di mijara çareseriya bi Kurdan re cidî ne û dixwazin ew û Kurdan bibin hevparê welat, wekî Ehmed Dawutoglu jî gotî, bila hişyar bin û lez bikin, ji ber nexşe dugherin û Kurd ne bê alternatîvin.

## Sudoku:Pirs 66

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | | | 4 | 1 |
| | 4 | 2 | 6 | | | | 3 | 5 |
| | | | | 2 | 4 | | 7 | |
| | | 7 | | | | | | 6 |
| | 9 | 3 | 2 | | 6 | 4 | 1 | |
| 2 | | | | | | 8 | | |
| | 8 | | 4 | 3 | | | | |
| 9 | 2 | | | | 1 | 7 | 8 | |
| 3 | 1 | | | | | | | |

## Sudoku: Bersiv 65

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 3 | 6 | 9 | 5 | 2 | 8 | 7 | 1 |
| 8 | 5 | 9 | 7 | 1 | 6 | 2 | 4 | 3 |
| 2 | 7 | 1 | 4 | 8 | 3 | 9 | 5 | 6 |
| 1 | 6 | 7 | 3 | 2 | 8 | 5 | 9 | 4 |
| 9 | 4 | 5 | 1 | 6 | 7 | 3 | 2 | 8 |
| 3 | 2 | 8 | 5 | 4 | 9 | 6 | 1 | 7 |
| 7 | 9 | 2 | 6 | 3 | 1 | 4 | 8 | 5 |
| 5 | 8 | 3 | 2 | 7 | 4 | 1 | 6 | 9 |
| 6 | 1 | 4 | 8 | 9 | 5 | 7 | 3 | 2 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Ga mir wê kêr lê pir bibin:**
- Bi heman wateyê.

Gayê xişt, mêrê bêpişt kî gihatiyê got, min kuşt
- Ji bo kesên bêxwedî tê gotin.

**Par li me dida bi dara, îsal xwe nagire li ser çardara:**
- Hêza wî ya berê nemaye; êdî nikare zordestiyê bike.

Şêwira çivîkan li ser serê garisê zerik e.
- Xwe bi wî re dibîne; ew kiriye reşê xwe; ji bo xwe nêçîreke hêsan û xweş dibîne.

**Tu pozê wî bigirî wê ruhê wî bikişe:**
- Pir ketiye; êdî nikare rabe ser xwe; rewşa wî pir xirab e.

**Tu bi serê pozê wî bigirî wê can ji here:**
- Bi heman wateyê.

**LI SER ÇAVBIRÇÎBÛNÊ**

**Çavbirçî ye/çavbirsî ye:**
- Ji tiştekî têr nabe.

**Çavçil e:**
- Bi heman wateyê.

**Çav li savarê kir, silav ji bîr kir:**
- Ji bo kesê çavbirçî tê gotin.

**Çavê wî di dinyayê de ye:**
- Ji malê dinyayê pir hes dike.

**Çavên wî têr nabin:**
- Çavbirçî ye; her tişta wî heye jî lê dîsa çavê wî li yê xelkê ye.

**Serî tevî pûrtê dixwe:**
- Têr naxwe; ji tiştekî têr nabe.

**Talanê moriyê liba cê ye:**
- Ne tima ye; ne çavbirçî ye

**LI SER SOSRETÎ Û ECÊBMAYÎNÊ**

**Çavvekirî ma:**
- Ma ecêbmayî; venehirî, matmayî bû.

**Çavên wî çûn pişta guhên wî:**
- Bawer nedikir tişteke wisa bibîne/ bibihîze; matmayî bû.

**Dû ji serê min çû:**
- Ez mam ecêbmayî.

**Dû ji serê min rabû:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Şehîd Şîlan Kobanê bi têkoşîna xwe bû mîrateyeke berxwedanê




Şîlan Kobanê endama Komîteya Navendî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê û hevalên wê Zekeriya, Ciwan û Fûad, di encama komployeke hevbeş a sîxurên rêjîmên Baas û Tirkiyê li bajarê Mûsilê bi awayekî hovane di 29'ê Mijdara 2004'an de hatin şehîdxistin.**R-2**

## 'Çapemeniya hikumeta veguhêz dengê gelên Sûriyê temsîl nake'



Hevserokê Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) Idrîs Henan da zanîn ku hikumeta veguhêz a Sûriyê bi rêbaza ku kî rizgar dike, hikum dike zimanê çapemeniya xwe li Sûriyê bikartîn e.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî   Jimar : 1329   30-Mijdar-2025   www.ronahi.net/ku/   Nirx: 500 L.S

# 'QSD`Ê JI BO ARTÊŞA SIBEROJÊ NIMÛNE YE'



**Endamê Rêveberiya Meclisa Leşkerî ya Kantona Firatê Mehmûd Qeremox diyar kir ku QSD`ê ji bo artêşa Sûriyê ya siberojê nimûne ye, armanca wê ya sereke parastina gel û avakirina Sûriyeke demokratîk e. Qeremox destnîşan kir ku têkoşîna QSD'ê ya ji bo berjewndiyên gel, ne li gorî berjewndiyên hinek hêzan e, ji ber wê ew hêz hewil didin ku tevliheviyê li herêmên Rêveberiya Xweser derxin.**

## 'Qonaxa duyem divê bi mafê hêviyê û guhertina zagonî were destpêkirin'



Ferzende Munzir tekez kir ku piştî avakirina komîsyonê diviyabû serdana Rêber Apo bihata kirin û got, "Pêwîst e qonaxa duyemîn a pêvajoyê bi mafê hêviyê û guhertina zagonan dest pê bike."**R-4**

## Komînên çalak û birêxistinkirî; navendên çareseriyê ne




Komîn nirxên civakî bi awayekî herî sade û azad tîne jiyîn û diparêze, Komînên çalak û birêxistinkirî; navendên çareseriyê ne...R-7

## Ji navdêrên jinên Kurd; Kurdistan Mukriyanî

Kurdistan Mukriyanî zimannas, nivîskar û çalakvana mafê jinan û helbestvaneke Kurd e. Di sala 1947'an de li bajarê Hewlêrê ji dayîk bûye, ji berhemên wê yên navdar Ferhenga Rûsî-Kurdî û Hevoksaziya Hevokên Têkel."**R-10**



## Hişkesaliya Kurdistanê û bandora wê li ser jiyanê

Li Kurdistanê, her ku diçe bandora hişkesaliyê bêtir xwe nîşan dide. Sûlav û çemên ku bi salan e diherikin, ji ber kêmbûna baranê zûwa bûn, di heman demê de xeteriya li ser berhemên çandiniyê, ajalvanî û xwezayê zêde dibe.**R-8**



## Ji çiraxên hunera Kurdî

Hunermendê Kurd Şiyar Agirî stûneke hunerî ya bilind û nîşaneke muzîkî ya bêhempa ye, wî hunera Kurdî kir neynika ronahiya nasnameyê û ruhê berxwedanê di rûberûya bîranînê de.**R-9**



**Bi îdeolojiya zayendîperestiyê dijminatiya li hember jinê**
Bêrîtan Xalid R-2



**Bi zanîna jêdera propagandayê re mesaj tê naskirin!**
Idrîs Henan R-4



**Muxeteb derket!**
Ahmet Aktaş R-6



**Cejn**
Remezan Olçen R-9

# Şehîd Şîlan Kobanê bi têkoşîna xwe bû mîrateyeke berxwedanê

Şîlan Kobanê endama Komîteya Navendî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê û hevalên wê Zekeriya, Ciwan û Fûad, di encama komployeke hevbeş a sîxurên rêjimên Baas û Tirkiyê li bajarê Mûsilê bi awayekî hovane di 29'ê Mijdara 2004'an de hatin şehîdxistin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Şehîd Şîlan Kobanê sala 1971'an ji bajarê Kobanê ji dayîk bû, di nava malbateke mezin a xwedî 5 keç û 4 zarokên kur de mezin dibe. Ew hîn di temenê biçûk de ji ber rewşa nebaş a aboriyê û zehmetiyên di vê mijarê de, rastiya penaberiyê fêm dike û dijî. Dema ku Şehîd Şîlan 5 salî bû, malbata wê koçberî bajarê helebê bûn, Şehîd Şîlan Kobanê yek ji zarokên keç ên malbata xwe ya pêşî ye ku diçe dibistanê. Malbat naxwaze wê rêbike dibistanê. Ji ber wê jî hîn di temenê biçûk de li dijî vê biryarê radiweste û diçe qeyda xwe li dibistanê çêdike. Ew hîn di zaroktiya xwe de dixwaze her kes rêz nîşanî vîn û daxwazên wê bide.

### Şehîd Şîlan di 9 saliya xwe de Tevgera Azadiyê nas kir

Şehîd Şîlan hîn di 9 saliya xwe de, di sala 1980'an de Tevgera Azadiya Kurdistanê nas dike. Her ku mezin dibe lêgera wê jî mezin dibe û hezkirinek mezin nîşanî raman û felsefeya Rêber Apo dide. Ew hîn di temenê ciwan de dikeve nav kar, xebat û têkoşîna azadiyê. Ji ber welatparêziya malbatê û xebatên dikin, Şehîd Şîlan Kobanê hîn di 12 saliya xwe de ji aliyê rêjîma Baas ve tê binçavkirin. Dema ku hîn refa navîn dixwîne û temenê wê hîn 14 bû, diçe kampên Tevgera Azadiyê yên li Libnanê û dixwaze beşdarî nava refên azadiyê bibe. Lê ev xeyala wê pêk ne hat. Ew li ser sînorê Sûriyê û Libnanê tê girtin, herwiha nêzî du mehan di bin çavan de tê destgirtin.

### Şehîd Şîlan lêgerîna azadiyê bû

Lêgerîna Şehîd Şîlan qet ranawestin, li pey heqîqet û rastiya dîrokî ya kurd û Kurdistanê, gav bi gav diherike. Ew xwe amade dike ku beşdarî şahiya Newrozê bibe, lê berpirsyarên dibistan û hevalên di pola wê de li dijî vê biryara wê derdikevin. Ew bi awayek tund li hemberî wan disekine û biryardariya xwe ya beşdarbûna Newrozê raber dike. Piştre ji ber sekna xwe ya siyasî Şehîd Şîlan Kobanê ew ji aliyê rayedarên Sûriyê ve tê girtin. Ji ber kevneşopiyên civakî û ferasetên paşverû yên li dijî jinê, Şehîd Şîlan di ciwaniya xwe de rastî gelek zor û zehmetiyan tê. Şehîd Şîlan ya di wê baweriyê de bû ku divê jin li hemberî kevneşopiyên li ser jinê tên ferzkirin bên parastin, hertim bi azadiya jinê bawer bû û têkoşiya.

Şehîd Şîlan Kobanê lêgerîna azadiyê bû. Tevgera Azadiya Kurdistanê jî vê pir zû ferq dike ku ew hertim di nav kelecana beşdarbûna nava refên gerîla de bû. Beşdarî çalakiyên li Helebê, komên jin û hunerê dibe. Di nava ciwanên Heleb û Efrînê de xebatên şoreşgerî dike. Herwiha bi kadroyên Tevgera Azadiyê re tevlî perwerdeyên îdeolojîk dibe. Gelek caran serdana kampên Partiya Karkerên Kurdistan PKK'ê yên li Libnanê û Sehîl El Biqayê dike û perwerde dibîn e. Piştî demekê jî li radyoya "Dengê Gerîla" erk digire ser xwe û dest bi xebatan dike.

Şehîd Şîlan 5 rojan di Girtîgeha Navendî ya Helebê şaxê ewlehiya siyasî ya girêdayî rêjîma Baas de dimîne û wê demê Şîlan ji yekemîn jinên Kurd bû yên Rojava ku li dijî îşkenceyê li ber xwe dide û parastina rêgezên xwe dike. Lewma ji desthilata serwer re îsbat kir ku jina Kurd nayê çewisandin, siyasetê dizane, dikare rêvebertî û pêşengtiyê bike. Şehîd Şîlan di sala 1990'î de tevlî Tevgera Azadiya Kurdistan dibe.

### Hilbijartina Şehîd Şîlan ji aliyê siyasî û leşkerî ve

Şehîd Şîlan di bihara 1995'an de tevlî yekemîn Kongreya Yekîtiya Azadiya Jinên Kurdistanê (YAJK) li herêma Metîna ya çiyayên Kurdistanê li dar dikeve, dibe. Ew civîna yekemîn a giştî bû ku nûnertiya jinên Kurdistanê li çiyayên Kurdistanê dike û bi rêya wê jinên azad ên Kurdistanê xwe bi xwe bi rê ve dibin.

Di kongreyê de şehîd Şîlan weke endama Komîteya Navendî hat hilbijartin û li ayaleta Zagrosê berpirsa yekîneyên jinên azad hat erkdarkirin. Dema yekîneyên leşkerî yên jinan wek tûgayan hatin avakirin, ev erka leşkerî ji şehîd Şîlan Kobanê re hat erkdarkirin. Di 2003'yan de û bi lidarxistina Kongreya Partiya Demokratîk PYD'ê li çiyayên Kurdistanê re Şehîd Şîlan Kobanê wek endama Komîteya Navendî ya PYD'ê hat hilbijartin.

### Şehîd Şîlan Kobanê bi nirxên azdiyê ve girêdayî bû

Li Rojavayê Kurdistanê şoreşeke azadiyê heye û bi dehan ciwanên Kurdistan û gelên azadiyê weke endamên YPG û YPJ ji bo azadiyê li ber xwe didin. Ji bo parastina nirxên xwe û mirovahiyê canê xwe feda dikin. Ev şoreş di encama keda Şehîd Şîlan, Cemîl, Fîdan, Dîcle, Îsmaîl, Şervîn û bi sedan xwîna şehîdan gihiştiye vê astê. Şehîd Şîlan salên dirêj di nava tekoşînê de cihê xwe girt. Li çiyayên Kurdistanê ji Botanê heya Zagrosan dîsa ji Başûr heya Rojavayê Kurdistanê, li her derên Kurdistanê ji bo azadiya gelê Kurdistanê têkoşîn dida meşandin. Şehîd Şîlan Kobanê bi nirxên azdiyê ve girêdayî bû. Zanista jin, zanista azadiyê, zanista felsefeya jiyana azad pê re di asta herî jor de hebû. Ji bo wê jî li hemberî şaşiyan, kesên komploger û dijberên xeta Apoyî xwedî helwest bû. Sekna wê sekneke bi zanistî bû. Herwiha Tevgera Apoyî li hember komployê xwedî helwest bû. Di destpêka derketina vê tevgerê ango dema şehadeta Şehîd Heqî Qerar û heta şehadet Şehîd Sakîne Cansiz û Şîlan, ev tevger herdem bûye hedefa hêzên komploger.

Di sala 1997'an de Şîlan derbasî bajarê Silêmaniyê yê Başûrê Kurdistanê dibe û dest bi xebatên rêxistinî dike. 1999'an de jî Şîlanê cihê xwe di rêveberiya Partiya Azadiya Jinên Kurdistanê de digire. Bi lidarxistina kongreya PYD'ê ya 2003`yan re wek Komîteya Navendî ya PYD'ê cihê xwe digir e. Piştre berê xwe da Rojava da ku beşdarî çalakiyên rêxistinî bibe. Dema ku têkoşera Kurd Şîlan kar û xebatên di navbera Iraq û Sûriyê dikir, 29'ê Mijdara 2004'an di encama komployeke hevbeş a ajanên rejimên Baas û Tirkiye bi hevalên xwe Zekeriya, Ciwan, Fûad û Cemîl li bajarê Mûsilê digihêjin asta şehadetê. Lê bi şehîdxistina Şîlanê re jî nekarin pêşiya şoreşa Rojava bigrin.

### Şehîd Şîlan ji bo tevahî jinan mîras û hêviyeke şoreşê li pey xwe hişt

Şehîd Şîlan Kobanî ne tenê ji bo xwe, ji bo tevahî jinan mîras û hêviyeke şoreşê li pey xwe hişt û bedela wê jî li ser navê hemû jinan da. Ji lewra ger şoreşa Rojava îro li tevahî cîhanê gav bi gav deng vedide û dibe navê hêviyan, ji ber di havênê wê de Şîlan Kobanê heye. Li Rojava "firîşteyên welatê bihûştê" bi navê Şîlan li pey eşqa azadiyê berxwedan didome û wê bidome.




## Ji Ramanên Jin



### Bi îdeolojiya zayendîperestiyê dijminatiya li hember jinê

**Bêrîtan Xalid**

'Kujerê Civakî yê Kastîk'. Koka peyva "kastîk" bi yûnanî ye û tê wateya "wêranker, yê tune dike, yê ji hundir ve dirizîne", yanî "kujerê wêranker".Têgeha ku Rêber Apo di pêvajoya derbasbûyî de bi me re parve kir, rastiya qirkirinê ya ku jin bi hezaran sal in pê re rû bi rû dimînin, bi rengê herî şênber vegotiye. Kujerê Kastîk komunalîteya bi pêşengiya jin-dayikê hate avakirin, nirxên wê yên civakî û sîstema wê ya jiyanê bi zordariyê tine kir û li şûna wê sîstemeke bi serweriya mêr, desthilatdarîperest û zordar a dewletê ava kir. Ev sîstema li dijî civakê ji ber ku hîn jî dewam dike, qirkirina jinê giran bûye.

Ev yek bi rê û rêbazên cuda tê kirin. Ji aliyekî ve bi îdeolojiya zayendîperestiyê dijminatiya li ser jinê û di nava tevahiya civakê tê belavkirin û tundiya psîkolojîk, fîzîkî û zayendî ya li jinê tê berfirehkirin. Li aliyê din jî bi şerê ku ji aliyê hegemonya kapîtalîst ve têne zedekirin zemîna qirkirina jinê tê xurtkirin. Em vê rastiyê di vê serdemê de li gelek deverên weke Sûriye û Sûdanê bi şênberî dibînin. Heta ku çanda destavêtinê ji holê neyê rakirin; li qadên felsefe, zanistî, estetîk, exlaqî û olî heqîqeta civakî dernakeve holê.

Tundiya mêr-dewletê jî yek ji şêweyê herî sîstematîk ê şîdetê ye ku li qadên jiyanê yên jinan belav bûye.

Ev şîdet, ku bi rêya qanûnên dewletê, hêzên ewlehiyê, dadgehan û medyayê tê kirin.Armanc dike ku beden, ked û dengê jinan kontrol bike. Ev serdestiya domdar a mêrserdest, li kolanan, li malê, li kar û di girtîgehan de, mafê jiyanê yê jinan hedef digire.

Rêber Apo dibêje ku; jin divê li cihê ku lê winda kirine, lê bigerin. Ger mirov vê gotinê lêkolîn û şirove bike, dê bighêje koka pirsgirêkê ya sereke ku di vê wateyê de jinan çawa .Jinên ku di hemu serdemên dîrokê de bi tundiyê re rû bi rû man li warên ku heqîqeta xwe winda kirine, şoreşa vejînê destpê kirin.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jinan bi şoreşeke civakî, bîrdozî û siyasî rê li ber serdemeke nû ya têkoşînê vekirin. Di sala 2025'an de ji qada civakî, heyanî xweparastinê û siyasetê ev têkoşîna jinan gihîşt lutkeyê.

Daneyên ku ketine ber destê me jî nîşan didin ku ji bo guhertin û veguhertina hişmendiya mêr pêdivî bi têkoşînekê bihêztir heye.

Di serdema me ya kapîtalîst de hêzên ku hebûna xwe li ser tunekirina jinê bihêz dikin, li hember têkoşîna jinan ketine rewşa xweparastinê.Her tim êrîşên cur be cur li hember jinan bipêş xistine.

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî jin, bûn hedefa tundiya hişmendiya netew-dewlet a Tirkiyê û çeteyên wê. Dewleta Tirk ku gelek deverên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dagir kiriye, bi deh hezaran jin neçar man ji cih û warên xwe koçber bibin.

Ger em bala xwe bidin dirêjahiya salê ya jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, mirov dikare bi teqezî bêje; Jinan bi baweriya parastina jiyana xwe ya ji her cûre tundûtujiyê, li dijî êrîşên netew-dewlet berxwedaneke bê hempa nîşan dan.

Ev sekin û helwesta jinan jî herî zêde di pêvajoya berxwedana bendava Tişrînê de xwe da der. Jinan bi felsefeya 'Em ji mirinê mezintir in' şoreş û destkeftiyên xwe parastin.



# Hişyariya zêdebûna birçîbûnê di cîhanê de

Rêxistina Xurek û Çandiniyê ya Neteweyên Yekbûyî (FAO) û Bernameya Xwarinê ya Cîhanê (WFP) bi raporeke hevbeş hişyarî dan ku bi mîlyonan mirovên li çar aliyê cîhanê wê bi metirsiya xelayê re rû bi rû bimînin.

**Lîloz Hisên**

Di Raporteke hevbeş de ku di 12'ê mijdara 2025'an ji aliyê Rêxistina Xurek û Çandiniyê ya Neteweyên Yekbûyî (FAO) û Bernameya Xwarinê ya Cîhanê (WFP) hatiiye weşan tê de eşkere kirin ku bêewlehiya xwarinê li 16 deverên kirîtîk bil lez xirabtir dibe û gefê li mîlyonan kesên din dixwe ku bikevin nav birçîbûnê an jî ber bi birçîbûnê ve diçin.



### Şer û tundûtûjî sedema sereke ya birçîbûnê ne

Dem ji bo pêşîgirtina li birçîbûna berfireh li deverên herî xeternak bi awayekî bilez diqede, ku pevçûn, hilwişîna aborî, hewaya dijwar û kêmasiyên giran ên fînansmanê rewşê xirabtir dikin. Tevî hewcdariya zêde ya pêşkêşkirina alîkariyên ku parastina jiyanê bi awayekî berfireh dike, lê fînansman bi awayekî xeternak sînordar dimîne.

Rapora Navendên Birçîbûnê ya vê dawiyê hatî weşandin, ku serdema ji Mijdara 2025'an heta Gulana 2026'an vedihewîne, eşkere dike ku pevçûn û tundûtûjî sedemên sereke yên birçîbûnê ne li 14 ji 16 deverên birçîbûnê hatine destnîşankirin

Di raporê de 6 welat û herêmên herî bi fikar dstnîşan dike: Hayîtî, Malî, Filestîn, Başûrê Sûdan, Sûdan û Yemen, ku mirovên van deveran bi gefa bûrçîbûna karîsetê a nêzîk rû bi rû ne.

Şeş welatên din jî wekî " Fikareke pir zêde" hatin destnîşankirin: Afxanistan, Komara Demokratîk a Kongoyê, Myanmar, Nîjerya, Somal û Sûriyê.

Çar deverên din ên birçîbûnê Borkîna Faso, Tişad, Kîniya û rewşa penaberên Rohînca li Bangladeşê ne.

### Kêmasiyên fînansmanê dibin sedema kêmkirina alîkariyê

Di nêzîkbûna van deveran li ber şert û mercên karîsetbar an jî birçîbûnê derbas dibin, fînansmana mirovî pir kêm e. Heta dawiya Cotmeha 2025'an, tenê 10.5 milyar dolarê Amerîkî ji eslê 29 milyar dolarê Amerîkî ku ji bo piştgiriya kesên herî lawaz hewce bû, hatibû wergirtin.

Kêmasiyên giran ên fînansmanê bersivên awarte asteng dikin, ku kêmkirina rasyonên xwarinê yên tund ferz dikin û gihîştina xwarinê ji bo kesên herî lawaz sînordar dikin di heman demê de alîkariya xwarinê ji bo penaberan nêzîkî xala şikestinê ye.

Bergirtina alîkariyê li piraniya deverên birçîbûnê kêm bûye, Bernameya Xwarinê ya Cîhanê neçar maye ku pîvanên hedefgirtinê hişk bike û alîkariya ji bo penaber û kesên ku ji hundir ve koçber bûne kêm bike. Di vê navberê de, bernameyên xwarina dibistanan û piştgiriya xwarinê yên pêwîst li hin welatan hatine rawestandin lewma zarok û malbatên koçber di xetereyek mezin de dihêle.

FAO hişyarî dide ku kêmasiyên fînansmanê hewlên parastina debara çandiniyê jî têk dibin, ku ji bo aramkirina hilberîna xwarinê û pêşîgirtina li krîzên dubare girîng in. Bêyî fînansmana lezgîn, alîkariyên girîng - wekî tov, karûbarên tenduristiya ajalan û tedbîrên çandiniyê berî demsalên çandiniyên û şikestinên nû nagihîjin civakan, dibe ku xetera kirîzên pêşrojê zêde bikin û qidreta berxwdanê kêm bike.

Li welatên ku birçîbûnê dijîn, hilberîna xwarinê li ser asta malbat û dahatê ji bo pêkanîna hewcedariyên bingehîn ne bes e. Bernameyên ku rû bi rûyînê xurt dike niha ji bo parastina debara jiyanê girîng in di heman demê de kêmkirina girêdayîbûna bi alîkariya awarte.

### Pêşîlêgirtina Birçîbûnê

FAO û Bernameya Xwarinê ya Cîhanê tekez dikin ku birçîbûn her gav pêşbînîkirî ye û dibe ku pêşgirtina wê bê kirin. Ew bang li civaka navneteweyî dikin ku bala gerdûnî ji nû ve li ser pêşîlêgirtina birçîbûnê bikşîne û zêdekirina îstîsmarkirina ewlehiya xwerinê ya dem dirêj û avakirina qidreta rû bi rûyînê sekinandin.

Rêveberê Giştî yê FAO Şo Dongyo got: "Pergalên hişyariyê yên zû dixebitin, ev ji bo girtina tedbîrên proaktîf girîng e. Divê em ji bersivdayîna krîzan ber bi pêşîgirtina wan ve biçin. Îstîsmarkirina ji bo derbara jiyanê, rû bi rûyînê û parastina civakî berî ku birçîbûn bigihîje lûtkeyên bilind dikare jiyan û çavkaniyan biparêze. Pêşîgirtina li birçîbûnê ne tenê erkek exlaqî ye ew di heman demê de îstîsmarek jîr e di aştî û aramiya demdirêj de. Aştî ji bo ewlehiya xwarinê şertek bingehîne û mafê xwarinê mafek bingehîn ê mirovan e

Her du rêxistin ji hikûmetan, bexşkeran û hevkarên xwe daxwaz dikin ku bibin bersiv ji hişyariyên ku tên destnîşan kirin ji hêla Dabeşkirina Qonaxa Ewlekariya Xwarinê ya Yekgirtî (IPC) û Sîstema Hevrêzkirî (HS) û berî ku rewş bigihîje astên karîsetê bi lez tevbigerin.

Her du rêxistin tekezî dikin li ser hewcdariya lezgîn a misogerkirina gihaştina mirovî bêyî astengî ji bo deverên bi bandor ên pevçûnê herwiha dibe ku karibin alîkariyên xwarin, xurek û çandiniyê ku parastina jiynan hewcdaran bike, bighînin wan.

Rêvebira Giştî ya WFP Cindy McKean got: "Em li ber karesatek birçîbûnê ne ku dibe ku em pêşîgirtina wê bigrin, ku gefê li çend welatan dike, dayik xwarinê naxwin da ku zarokên wan bixwin û malbat jî ew kêmasiya ku ji wan re maye dixwin û ji bo jiyanê têdikoşin. Em bi lezgînî hewceyê fînansmana nû û gihîştina bê asteng in, nikarînbûna tevgera niha dê bibe sedema zêdebûna bêîstîqrarî, koçberî û pevçûnê."

FAO û WFP tekez dikin ku pêşîgirtina li birçîbûnê mimkun e, lê tenê bi îradeya siyasî, pêşengtî, fînansmana têr û berpirsiyariya kolektîf. Bi milyonan giyan xwedispêrin tedbîrên biryardar.

# Herêma Kesk.. pilana Washingtonê li Filestînê

**Navenda Nûçeyan**

**Li gorî raporek di The Wall Street Journal de hatiye weşandin, Amerîkayê planên avakirina kampan ji bo Filistîniyan li aliyê Îsraîlê yê sînorê Xeza-Îsraîlê; didomîne. Tîmên endezyaran tîne û dest bi dûrxistina sivîlan ji herêmên di bin kontrola Hemasê de dike.**




Amerîkayê planên ji bo avakirina kampên bi ewle yên alternatîf di nava deverên Xezeyê yên di bin kontrola Îsraîlê de pêş dixe, ku ji hêla rayedarên Amerîkî ve wekî "Herêma Kesk" têne binavkirin.

Rayedarên Amerîkî eşkere kirin ku di riya avakirina van kampan de armanc dikin ku mal, dibistan û nexweşxaneyan ji bo gelê Xezayê yên ji ber şer koçber bûne; peyda bikin, heta ku ji nûve bajar bê ava kirin. Ev kamp dê wekî modelek ji bo ji nû ve avakirina pêşerojê be, rayedar hêvî dikin ku gelê Xezayê dûrî herêmên di bin kontrola Hemasê bixin.

### Dabeşkirina Xezeyê

Tê pilankirin ku avakirina kampa yekem dibe ku li Refihê be, ku bajarê sereke yê li Xeza ye dikeve li ser sînorê Misirê. Ev bajar ji aliyê hêzên Îsraîlê ve bi giranî zirar dîtiye û ji meha Gulanê ve di bin kontrola Îsraîl de ye. Rayederên Îsraîlî û Amerîkî destnîşan kirin ku plana Refihê hîn di qonaxên xwe yên destpêkê de ye. Kontrola Xezeyê di Cotmehê de wekî beşek ji peymana agirbestê ya ku ji hêla Trump ve hatî kirin, du beşan hatiye dabeşkirin, pranaiya Filestîniyan li aliyê rojava yê di bin kontrola Hemasê dijî û Îsraîl kontrola aliyê din dike.

### Ji bo ewlekirina Xezeyê hêzeke ewlehiyê ya navneteweyî wê bê avakirin

Amerîkayê û hevalbendên wê ji bo avakirina hêzeke ewlehiyê ya navneteweyî ji bo ewlekirina Xezeyê dixebitin, Konseya Ewlehiyê ya Neteweyên Yekbûyî ev plan pejirand. Lê nakokiyên li ser berpirsiyariyên wê - gelo ew ê bi sepandin û bêçekkirinê were erkdarkirin, an jî tenê weke parastina aştiyê ye.

Li gorî rayedarên Îsraîlî, yek ji ramanên ku tê nirxandin ew e bikaranîna komên çekdar ên li dijî Hamasê ku ji hêla Îarasîlê tên piştgîrkirin; rêveberiya kampan bikin. Ev komên li dijî tevgera Hemasê bi rastî van kampan di hundirê herêma Kesk li Xezayê ava dikin, ku bi sedan heya çend hezaran kesên sivîl lê dijîn. Ya yekem ji van kampan di dema şerê Xezeyê de li Refihê ku di bin kontrola Îsraîlê de ye hat avakirin.

Rayedarekî Amerîkî got ku Amerîkayê li Xezeyê nafikir e ku bi van koman re bixebite. Rayedarên Amerîkî hêvî dikin ku deverên ku ji hêla Hemasê ve têne kontrol kirin bi demê re bi dawî bibin. Di heman demê de hêzeke îstîqrariyê ya navnetewî li kêleka polîsên Filistînî berpirsiyariya ewlehiyê bigirin ser xwe herwiha Konseya Aştiyê ya Trump dê rêveberiya sivîlî û çavdêriya ji nû ve avakirinê bike berî ku di dawiyê de kontrolê radestî hikûmetek Filistînî bike.

Lêbelê, dîsa jî Hamas ji bo çekdayînê herwiha nêrîna Amerîkayê ji bo xeza red dike, bi hinceta ku ew mafê siyaseta Filestînê têk dibe.

# Rastiya civaka mirovahî di nêrîn û fikrên Rêber Apo de

**Asya Waşûkanî**

Civaka xwedî temenekî dirêje ku were naskirin tekez gerek bi hurgilî rastiya civakê were lêkolîn kirin. Lêkolîn kirina wan rastiyên heyî jî dibinê kavil û şînwaran de, li benda derketina ronahiyê ye û tekez eyan kirina wan daneyan jî; erk û peywira bingehîn a her ferdekê\î ji malbata mirovahîyê ye. Gerek mirov li ser kokena xwe weke mirov û civak, mirovahî lêkolîn bike û rastiyên wê yên veşartî û dewlemend bi teyisîna; jiyana hemdemî û watedartir bike û weke ku têye zanîn, wê civaka mirovahî a ku ji kokena xwe dûr ketiye xwe lêvegerekê jiyan bike. Wekê ku em hemû jî dizanin hişmendiya bîrdoziya pergala sermayedar, wiha bi mirovan daye famkirin ku dawiya dîrokê hatiye û bi demê re; civak ji kokena xwe dûr ket û bû civakeke li hevçêkirî.

Wekê ku têye zanîn herî zêde jî di van 500 salên dawiyê de, pergala sermayedar bi hişmendiya xwe ya desthilatdar û mijokdarî zanistan pozîtîvîst; li hemberî felsefê û zanista civaka xwezayî weke çekekê bikar, anî û civaka mirovahî ji qalibekî derbasî qalib û dogmayên nû kirin. Roj ew roj bu ku civaka mirovahî her gavên xwe paşda avêtine û kete nava qalib û dogmayên hesinî de û hîna jî ew dogma û qalibên cemidî bandora xwe li ser fikir û rêbazê jiyana civakê dike, wan dinava çerxa feleka, xwe de digerîne û wan ji hêz dixe ji bo ku li ser wan siyaseta, xwe ya xapîner pêkbîne û berê wan bide dojeha sor û sotîner. Her ku Rêber Apo dibêje: Ez ne Îsa me ku ez we hemûyan xelas bikim lê cardin jî ez, jî dibêjim ku Rêbertî ji Îsa jî zêdetir ji civakê re têkoşîn kir û civakê anî pileya ku xwe nasbike û haj li siyaseta pergala desthilatdar û mêrperest, bibe û têkeve nava lêkolînê de. Fikir û ramanên Rêber Apo ên ku ji destpêkirina xwendina, wê pirtuka ku di xewgeha ku tê de dima ya li baytexta Tirkiyê Enqerê de; dibin balgeha xwe de dît û xwend û li wir dibêje" Ew pirtûk elifbaya sosyalizmê bû ku min xwend û min kelecan jê girt, min got Muhemed wenda kir û Lenîn qezenc kir". Mirov dibîne ku Rêber Apo di wan kêliyan de, rastiyên civaka dîrokî veşartî bi hestên xwe yên kur û bê dawî his kir; ji xwe ji zarokatî de Rêbertî her dinava lêgerîna jiyana, wekhev û azad debû. Bi keşif kirina Rêber Apo ya fikir û felsefa zanista civakî hîn, zêdetir haj li rastiyên jiyana heyî ya ku destên gemar li ser bûye û wê lewitandiye; dibe û lêgerîn xwe ya ku ji zarokatî de dabûye destpê kirin hîn, xurtir dike û bersiva nakokî û lêgerîna xwe dibîne.

Rêber Apo roj bi roj têkoşîna xwe, hîn xurtir dike û di dahurandineke xwe ya sala; 1995 an de dibêje: "Ger ku gelê min nezan û cahil be wê demê ti wateya pêşveçûna, min jî weke ferd nîne û gerek ez gelê xwe jî perwerde bikim û wan bînim; pileya xwe ya fikrî de ji bo ku em têkoşîna xwe bi hevre, berdewam bikin" û ji heval, hogir û şagirtên xwe de dest bi perwerdê kir. Herî zêde jî li ser rewşa jin û civakê radiwestiya û di got: Her çiqasî em şer û teoriya wê pêşbixin jî wê tenê ji bo, parastina rewa be û ji bo mafê xwe yê xwezayî û netewî bi destxistin be; lê zanebûna zayendî û civakî wê mayendî be û bi rojan, heyv û salan têkoşîna bîrdûzî û zanyarî kir. Her hewilda ku civaka Kurd ji nezanî û cahiltiyê xelas, bike û hingî ku perwerde dida doktoran jêre gotibû ku; gewriya te ji ber axaftin û nîqaşên zêde dêşe û ger ku ti wiha berdewam bike, dibe ku di gewriya tede nexweşî giran bibe û ti hew karibî biaxivî. Lê cardin jî Rêber Apo perwerda kadro û gel berdewam kir û hîna, jî berdewam dike û hemû hewildanên xwe jî ew bû ku gelê Kurd ji rewşla ku têdeye; xelas bike û wan bi bigîhîne çerxereya dîrokê hê jî dinava, wê hewildanê deye û bi kelecan û coşeke xurt û ciwanî, kar û xebat dike û dibêje Gelê Kurd gerek bibe weke modêla gelê ku ji bo çareseriya, aşîtî û civaka demokratî re têkoşîn dike û ji wî gelê ku ew perwerde; kirin, zana kirin û misyona pêşengtî û serkêşîya civaka, mirovahî daye ser şanê wan. Rêber Apo mamoste û mîmarê civaka wekhev û demokratîk, ji civaka Kurd destpê kir û derbasî civaka Rojhilata Navîn bû. Ji civaka Rojhilata Navîn jî îro Cîhanî bûye û roj, bi roj fikir û ramanên xwe hîn zêdetir dewlemend kir û kire malê mirovahiya gerdûnî û gelê Kurd.

Ev hemû encamê berhem û keda Rêber Apo û tekoşîna 52 salan a Rêber Apo ya ku di şexsê gelê Kurd e ji bo mirovatiyê hatiye kirin. Her kes îro dibîne bê ka çawa mirovahî têkoşîna Rêber Apo, dinirxîne û wate dide pêvajoya ku daye destpê kirin û hewildidin ku; pêre bibin destek lê şaştiyên pir mezin hene ku têne jiyan, kirin û weke ku têye zanîn gelek zanyar, hukuknas, entelektiuel û fîlozof, hene ku ji pergala desthilatdar û sermayeparêz hesaban dikin û nikarin nerînên xwe vekirî bibêjin. Ev jî şermeke mezin ji wan aqilmendan re û bingeha fikrîna rast, zanistî jî ewe ku rast gotine û ger ku nikarin rast bibêjin ev jî lawaziyeke ne ji rêzêye. Ji xwe tişta ku Rêber Apo balêdikişîne ser û dibêje Jî ewe ku gerek her kes xwe bide ber barê mirovahiyê û têkoşîn, bike naxwe wê mirovahî wenda bike û rewşa civaka mirovahî ber bi serberjêriyeke xeternak ve diçe. Pêwîste mirovahî xwe bide ber barê paradîgma nû a ku Rêber Apo, daye destpê kirin û gerek têkoşîneke komînal a cîhanî were destpê kirin.

# Ji navdêrên jinên Kurd; Kurdistan Mukriyanî

**Esma Mistefa**

**Kurdistan Mukriyanî zimannas, nivîsikar û çalakvanê mafê jinan û helbestvana Kurd e. li sala 1947'an a Zayînî li bajêrê Hewlêrê ji dayîk bûye. Bavê Kurdistan Mukriyanî, "Gîvî Mukriyanî" ji ber heskirina ku bi Komara Kurdistanê re hebûye, nave keçika xwe kiriye "Kurdistan" û hin deman ev navê han jêra bûye bi pirsgirêk jî, berpirsên Beis jê ra gotine navê te Kurdistan e û tu cudahîxwazî, pir bi zehmetî nasnameya Iraqê jêra dane. Huznî apê wê bûye.**



Di sala 1923'an de bavê Kurdistan Mukriyanî yanî Gîwî û apê wê Huznî diçin Bexdayê, di sala 1925'an de jî diçin Rewandizê û di sala 1926an de li wir çapxaneyek ava dikin û kovara "Zarê Kurdmancî" derdixin.

Li kêleka Çapxaneya Kurdistanê bo çapkirina pirtûkan, Gîwî Mukriyanî kamerayekê tîne Hewlêrê da ku wêneyên rewşenbîr û kesayetan pê bigire. Li Hewlêrê kovara "Ronakî", rojnameya "Hewlêr" û kovara "Hetaw" di çapxaneya wî de dihatin çapkirin.

Kurdistan Mukriyanî xwendina xwe ya destpêkî, navîn û dibistana navîn li Hewlêrê qedandiye. Û piştî ku li zanîngeha Bexdayê bawernameya Kaloryos bi pileya yekem li beşa zimanê kurdî werdigire, ji bo qedandina xwendina xwe ya bilind diçe Moskowê. Di sala 1977'an de li Enstîtuya Rojhilatnasiyê ya Akademiya Sovyetê doktoraya xwe di warê fîlojolojiyê de wergirtiye û di heman salê de vedigere Kurdistanê û li zanîngeha Silêmaniyê tayîn dibe. Di navbera salên 1978-1982'an de li zanîngeha Silêmaniyê û piştre jî li zanîngeha Selahedînê serokê beşa zimanê kurdî bû. Di sala 1982'an de diçe Bexdayê û heta sala 1987an di Dezgeha Çand û Weşanên Kurdî ya Wezareta Rewşenbîrî û Ragihandinê de kar dike. Li wir di kovarên Beyan û Rewşenbîriya Nû de gotaran belav dike.

Di sala 1991'ê de çûye Holendayê û li Navenda Wergeranê wek pispor û nirxîner kar dike. Û di sala 1999'an de li dezgeha çap û weşana Aras serperiştiya amadekirin, ji nû ve nivîsîn û çapkirina "Ferhenga Kurdistanê" kar kiriye. Di sala 2000'an de bû bi endameka çalak a Komîteya Kargêrî ya Kora Zaniyariyên Kurdistanê û di sala 2006'an de jî bû seroka wê. Di sala 2001ê de bû sernivîsera kovara "Şaûşka", ku kovareke rewşenbîriya demsalî bo jinan bû, û di sala 2002'an de "Navenda Şaûşka ji bo çalakiyên rewşenbîrî" ava kir. Û di sala 2007'ê de wek sekretera Yekîtiya Jinên Kurdistanê hat hilbijartin.

Berhemên Kurdistan Mukriyanî:

- Ferhenga Rûsî-Kurdî, Moskov ya 1977'an.
- Jin di vehûnandina helbesta Kurdî de, Silêmanî 1978'an.
- Rêzimana Kurdî ji bo Pola Yekem a Beşa Zimanê Kurdî ya Zanîngehên Iraqê (bi alîkariya Nesrîn Fexrî), Hewlêr, 1982'an.
- Wergera pirtûka (Rêzimana Kurdî: Bi Amûrên Devokên Kurmancî û Soranî) ya Kanala Kurdoyv ji Rûsî bo Kurdî, Çapxaneya El-Adib El-Bexdadî, 1984'an.
- Hevoksaziya Hevokên Têkel, Weşanxaneya Aras, Hewlêr,2004'an.



# 'QSD`ê ji bo artêşa siberojê nimûne ye'

**Endamê Rêveberiya Meclisa Leşkerî a Kantona Firatê Mehmûd Qeremox diyar kir ku armanca wan a sereke avakirina Sûriyeke demokratîk e û wiha got: " QSD`ê ji bo artêşa siberojê nimûne ye, ev têkoşîna me ya ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û yekpar, gelek caran ne li gorî berjewndiyên hinek hêzan e, ji ber vê jî li dijî me êrişan pêş dixin û dixwazin li herêma me tevlîheviyê çêbikin."**

**Viyan Egîd/Firat**

Tevî derbasbûna 9 mehan di ser imzekirina peymana 10 Adarê re, lê hikumeta veguhêz a Sûriyê ji bo pêkanîna wê tu gavên berbiçav neavêtine. Bi taybet di aliyê tevlîbûna QSD'ê di nava artêşa Sûriyê a Nû de hikumet pir giran tvdigere û îradeya wê ne di destê wê de ye. Herwiha li aliyekî din jî êrişên çekdarên hikumeta veguhêz li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dewam dike.

Di vê çarçoveyê de endamê Rêveberiya Meclisa Leşkerî a Kantona Firatê Mehmûd Qeremox ji Rojnameya me re axivî.



### 'Yên ku çeteyên DAIŞ û xeteriya wê ji hole rakir, QSD û YPJ`ê bûn'

Mehmûd Qeremox di destpêka axaftina xwe de diyar kir ku çeteyên DAIŞ`ê bi destê QSD`ê hat tune kirin û wiha pêde çû: "Dema ku çeteyên DAIŞ`ê li seranserî cîhanê hatibû belav kirin, di heman demê de mîna ku vayrûzekî di nava civaka me de belav bû û dixwestin civakê bidin tûne û talankirin. Lê belê ev yek ji aliyê gelê Kurd ve ne hat qebûl kirin. Li ser vê esasê hêzên YPJ û YPG li hemberî vê zehiyetê derketin, her wiha şer, tekoşîn û berxwedaniyeke bê hempa hat meşandin. Bêguman di dema ku Hêzên Sûriya Demokratîk QSD`ê jî hat damezrandin, bi xwe re gelek serkeftin û destkeftî bi anî. Yên ku çeteyên DAIŞ û xeteriya wê ji hole rakir, hêzên QSD û YPJ`ê bûn. Ne şerekî hesan û rehet bû, bêguman QSD û YPJ ne tenê parastina Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir, lê belê parastina Sûriyê û Rojhilata Navîn ji xeteriya DAIŞ`ê kir. Ev yek hişt ku hêza me ji tevahî cîhanê re bibe mînak û cihê ewlehiyê. Di roja me ya îro de jî em nikarin bêjin ku DAIŞ bi temamî hatiya tunekirin, raste DAIŞ hat tunekirin lê hîne ew şaneyên razayê ku dixwazin DAIŞ ji nû ve zindî bibe û civakê me tevlî hev bike. Ji ber vê yekê heya roja îro car caran êriş li ser hêz û xalên leşkerî çêdibe, lê hêzên QSD û YPJ heya astekî baş û bilind xwedî li parastin û bersivekî xurte. Di heman demê de gelek oparsyonên ewlehiyê ji aliyên hêzên me didomin ku gelek şaneyên DAIŞ`ê tên girtin."

### 'QSD û YPJ hêzekî ji bo mirovahî û aştiyê ye'

Mehmûd da zanîn ku bi saya QSD û YPJ`ê rewşa Sûriyê ber bi guhertin û veguhertinê de derbas dibin û wiha domand: "Wek tê zanîn ku di 8`ê kanûna 2024`an de rêjîma Baas hat helweşandin, dema em dibêjin rêjîma Baas hat helweşandin û Heyet Tehrîr Elşam hat ser desthiledariya Sûriyê û karîbû Sûriya ji rêjîma Bass rizgar bike, lê ne wiha ye, tiştek bi navê rizgarkirin ango şerkirin tune bû. Hatine hikumeta veguhêz a Sûriyê di nav hevde pilanekî navetewî bû. Ji ber ku hatine Ehmed Elşeri li ser desthiledariya Sûriyê û qeblkirina dewleta ji bo hatina wî, bi serê xwe gumanek bû. Di salên borî de Amîrîka û dewletên din daxwaza Ehmed Elşerî (Colanî) dikirin, di heman demê de Amîrîkiya yê digot, "Yê ku Ehmed Şerei ji me re bîne û radestî me bike, emê meliyonan dolarên Amrîkî bidin wan". Bi vê yekê girêdayî gelek dewletên din jî wiha digotin, lê dema ku her kes dît çawa Ehmed Elşeri hat li ser destihledariyê, li vir gelek goman û pirs çêbûn. Lê ev yek diyar bû ku pilanek e, bilat u kes nebêje ku wan şer û Sûriyê rizgarkirin. Tenê hêzên ku bû 13 sal li hemberî hemî terorîstan û çeteyan şer kirin QSD û YPJ`ê bûn, ev ne tenê em dibêjin, lê belê tevahî cîhan bû şahidê vê yekê ku hêzên QSD`ê û YPJ`ê têkoşîn û berxwedaniyeke bê hempa da meşandin û heya roja îro jî ji bo parastina herêmê di nava lev û tevgerê dene, di heman demê de ji bo parastina Sûriyê jî hêzên QSD û YPJ`ê hazirin. Bêguman QSD û YPJ hêzekî ji bo mirovahî û aştiyê ye.

Me û tevahî cîhan jî dît ku çawa komkujî û talankirin li ser Elewiyan, Durzî û tevahî pêkhateyên li Sûriyê de dijîn, ji aliyê hikumeta veguhêz a Sûriyê ve hat pêk anîn. Ev kiryar û sûcên şer yên li heberî durzî û Elewiyan pêkanîn, hat diyar kirin ku ev ne hikumeteke ji bo çareserî û aştiyê ye. Her ku roj derbas dibû, mirov dizanî ku Şerei tenî fîzîkî li ser desthilatdariyê ye, dewleta Tirk wî bi rêve dibir, di heman wextî de Israyîl û dewletên navdewletî wî bi rêve dibin, ev jî pirs û gumanek di mejiyê me de dide avakirin, em dibêjin ku Ehmed Elşeri bi vî halî wê çawa Sûriyê bi rêve bibe, her wiha wê çawa bi van kiriyar û sûcên şer Sûriyeke demkratîk û aştî bide avakirin? Helbet wê nikaribe, ji ber niha her kes Şerei li gor xwe û berjewandiyên xwe bi rêve dibin. Heya niha rewşa Sûriyên di nava metirsiyekî de ye, heya ku di Sûriyê de ew zehniyeta parçebûn, yek ziman, olparest û yek dirûşme hebe wê çareserî dûr be. Mirov ji bo berjewendiyê gelê û daxwazên welatê xwe tevdigere, pêwîst e parastina gel esas bigre, ne komkujî û parşekirinê di nava pêkhateyan pêk bîne ev yek wê pirsgerêk û şer jî bi xwe bîne, tu kes van kiryaran qebûl nake. Di heman demê de wê temenê Şerei li ser desthilatdariyê kurt be."

### 'Pêwîst e hikumeta veguhêz a Sûriyê zehniyeta xwe ya pûç bidawî bike'

Mehmûd Qeremox di berdewamiya axaftina da xuyakirin ku heya roja îro mijara tevlîbûna QSD`ê di nava artêşa Sûriyê nehatiye erê kirin û wiha pê de çû: "Piştî peymana 10`ê Adarê hikumeta veguhêz a Sûriyê dixwaze QSD`ê tevlê artêşa xwe bike, lê ev wiha bi hesanî jî nayê erêkirin, ji ber ku heya niha me bawerî nedaye hikumeta veguhêz ku em hêzên xwe tevlî artêşa Sûrî bikin. Ya din jî QSD`ê xwedî tecrûbeyên mezinin, di şer û istratîjiya wê de pespor bûye, ji ber vê yekê pêwîste artşa Sûrî tevlî QSD`ê bibe. Di nav ewqas salan de me bi hezaran şehîd dan e, ev yek ne ji bo ku bi hesanî QSD`ê tevlî artêşê Sûriyê bibe. Her wiha heya ku destûrekî nû ji bo gelê kurd û hêzên me neyê nivîsandin, di heman demê de pêwîst e ew zehniyeta xwe ya pûç bidawî bikin. ji bo ku dema QSD`ê tevlî artêşê jî bibe, bawerî hebe. Em dibînin ku îro çawa gelê Sûriyê li dijî kiryarê hikûmeta veguhêz a şamê derdikeve, heya niha hikumeta veguhêz a şamê nikarî xwe dinava gel de bide qebûlkirin û îsbat kirin, lê QSD`ê xwe ji tevahî cîhanê re daye îsbat kirin û bûye cihê ewlehiyê û aramiyê. QSD`ê ji bo artêşa pêşerojî nimûne ye."

### 'Bila çekdanîna QSD`ê ji xwe re bikin xewin, lê di rastiyê de wê nebînin'

Endamê Rêveberê Meclisa Leşkerî a Kantona Firatê Mehmûd Qeremox di daeiya axaftina xwe de da xuyakirin ku QSD`ê ne mumkine çek deyine û wiha anî ziman: "Di çapameniya Tirkan de ew mijarên ku dixwazin bikin rojeva xwe de mîna fesxkirina Partiya Karkerê Kurdistan PKK`ê ku pêwîst e li hole nemînin û wan mîna teslîmiyetê digirin dest, lê berovajî wî fesxkirina PKK`ê guhertina û veguhertina pêvajoya ku Rêber Apo daye destpêkirin. Wekî ku em dibêjin ev gavek nûye. Niha jî çapemeniya Tirkan mijara PKK`ê têrker nedîtin, êdî dixwazin QSD`ê jî çekên xwe deyine, lê bila dewleta Tirk û hemî dewletên hegemon bizanbin ku QSD`ê tu carî çekên xwe na deyine û na jî di şewitîne. Bila çekdanîna QSD`ê ji xwe re bikin xewin, ama di rastiyê de wê nebînin. Em çekên xwe bi hemî hêz û îradeya xwe di parêzin û bi hezaran şehîdên me çêbûne. Di heman demê de QSD`ê ji bo gelê Sûriyê rûmet e. ji bo me parastin bigeha jiyanê ye.

hedefa me avakirineke Sûriyek demokratîk û yekpar e. Ev têkoşîna me gelek caran hesabên hinekan xirab dike. Ji ber vê jî li dijî me êrişan pêş dixin, dixwazin li herêmên me tevlîheviyan çêbikin. Gelê me yê Ereb ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê ev lîstok dîtiye û ketiye zanbûna wê. di şexsê pêkhateya me ya Ereb ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, dibêjim ku sekna hemû pêkhateyên herêmê, temînata siberoja Şamê û tevahiya Sûriyê ye. Tişta ku li Siweydayê li ser gelê Dûrzî hat meşandin, ne bi destê eşîran e, ew lîstokên îstîxbaratî bûn. Dixwazin bi rengên cuda li ser gel qirkirinan bimeşînin. Ez di wê baweriyê de me ku gelê me di zanebûna wê de ye û neyên van lîstokan. Bi hebûna me ya bi hev re, em ê bi giştî Sûriyê ava bikin. Artêş, ji bo parastina destkeftiyên demokratîk yên civakî ne, bi qanûnên siyasî tên avakirin. Artêş lazime bibe nûnera hemû pêkhateyan. Siyaset bi çi rengî be, artêş jî bi wî rengî ye. Di hişmendiya me de artêş hêzên parastinê ne, yekser bi hedefên siyasî ve têkildar in. Bi serê xwe tiştekî cuda nîne. Sîstem çi be, artêş ji bo parastina wê sîstemê ye."



# ‘Qonaxa duyem divê bi mafê hêviyê û guhertina zagonî were destpêkirin’

**Ferzende Munzir tekez kir ku piştî avakirina komîsyonê diviyabû serdana Rêber Apo bihata kirin û got, “Pêwîst e qonaxa duyemîn a pêvajoyê bi mafê hêviyê û guhertina zagonan dest pê bike.”**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Civîna 18’an a ku di 21’ê Mijdara 2025’an de pêk hat, bi piraniya dengan biryar hat dayîn ku li Girtîgeha Îmraliyê guhdariya Abdullah Ocalan bikin.
Li gorî vê biryarê, şande di 24’ê Mijdara 2025’an de çû Girtîgeha Ewlehiya Bilind a Tîpa F a Îmraliyê. Piştî Banga Aştî û Civaka Demokratîk a ku Abdullah Ocalan di 27’ê Sibatê de kir.
Komîsyon niha û bi şûn ve jî ji bo armancên xwe pêkbîne wê helwesta xwe ya biryardar bidomîne.
Derbarê serdana Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratiya Neteweyî ji bo Rêber Apo endamê Rêveberiya Însitatîfa Sûrî ya Ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir ji rojnameya me re axivî.

**‘Diviyabû piştî avakirina komîsyonê demildest serdan pêkbihata’**

Ferzende tekez kir ku diviyabû piştî avakirina komîsyiyonê serdana Rêber Apo were kirin ji hêla komîsyonê ve û wiha got: “Wekî tê zanîn piştî gelek civîn hevdîtinan komîsyonê serdana Rêber Apo kir, ev serdan gaveke gelekî baş bû, lê diviyabû piştî avakirina Komîsyona Demokrasî, Xwişk, Biratiya Neteweyî demildest vê komîsyonê serdana Rêber Apo bikira. Ji ber di vê pêvajoyê de, du alî hene, aliyek jî Tirkiyê ye û aliyê din Rêber Apo ye ku nûnerê gelê Kurd û Tevgera Azadiyê ye. Serdan hat kirin, lê bi serdaneke tenê, her tişt çareser nabe, divê komîsyon hertim serdana Îmraliyê bike, herwiha pêwîst e Rêber Apo bikaribe danûstandinê bi hemû kesî re bike, hem jî parêzer, malbata wî û ragihandin biçe pê re bicive. Ew pêvajoyê bi rê ve dibe û ew nûnerê doza gelê Kurd. Kurd bi sedên salan rastî înkar û qirkirinê hatin, hem jî Tevgera Azadyê xwedî dîrokeke têkoşînê ye. Ev pêvajo bi hevdîtinekê û di çend rojan de nayê çareserkirin, tenê bi guhdarkirinê jî her tişt çareser nabe. Di her hevdîtineke Rêber Abdullah Ocalan de ew xwedî nêrîn û raman e ji bo pêvajoyê, lewma divê komîsyon pakêtekê amade bike da ku axaftinên Rêbertî bibin bingeh di guhertina makezagonê Tirkiyê û çareserkirina pirsgirêka Kurd de.”

**‘Neçûna CHP’ê kêmayîyeke dîrokî ye, divê helwesta xwe sererast bike’**

Munzir da zanîn ku neçûna CHP’ê şaştiyeke dîrokî bû û wiha domand: “CHP’ê partiya avakirina komara Tirkiyê ye, ev partî jî sûcdar e di warê kirina qirkirina gelê Kurd de wê jî para xwe ya inkara Kurdan biriye. Di deh salên dawîn de CHP’ê bi rengekî erênî nêzî pirsa Kurdî dibû û daxuyaniyên baş ji bo doza Kurdan, hem jî demokrasiya Tirkiyê dikir. Dema ku komîsyon serdana Rêber Apo kir û ew amade nebû, êdî mask li ber heqîqeta wan û gelek rastiyên din hat xuyakirin. Em dikarin bibêjin hemû gotinên wan û tişta ku dikirin tev propaganda û siyasetek bû da ku gelê Kurd bi aliyê xwe ve bikişîne û ji bo berjewendiyên xwe. Dema ku CHP’ê bi şanda komîsyonê re neçû, wê kêmasiyeke dîrokî kir, divê vê helwesta xwe sererast bike. Bila CHP’ê pêvajoyê û pirsgirêka Kurd weke tiştekî demkî nebîne, ev pêvajo pêvajoyeke istratejîk e û doza gelê Kurd, hem jî mijara demokrasiyê mijareke sereke ye. Ji ber vê yekê jî hîle û berjewendiyên teng wê zerera herî mezin li CHP’ê bike. Berdêla vê yekê pêwîst bû şaştiya xwe ya inkara Kurdan kir a 100 salî kir, sererast bike.”

**‘Qonaxa duyemîn bi mafê hêviyê û guhertina zagonan pêktê’**

Rêveberiya Însitatîfa Sûrî ya Ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan Ferzende Munzir destnîşan kir ku pêwîst e qonaxa duyemîn a pêvajoyê bi mafê hêviyê û guhertina zagonan dest pê bibe û wiha bi dawî kir: “Ji bo pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi rehetî û duristî were meşandin divê zagon li Tirkiyê werin guhertin.



Di nava van zagonan de jî pêkanîna mafê hêviyê ji bo Rêber Apo ye. Serdana komîsyonê wê pêvajoyê ber bi qonaxa duyem ve bibe. Li gorî encamên vê serdanê diyar bû ku mijarên di çarçoveya pêvajoyê de nehatin nîqaşkirin, teslîmiyeta QSD’ê û çekdanîn tiştekî nemûmkin e, Rêber Apo di nirxandinên xwe de tîne ziman ku her beşekî Kurdistanê taybetmendiyên wê hene. Li Rojava jî QSD’ê şûrê edaletê û parastina pêkhateyên Sûriyê ye, bila tikes xewnên wiha neke. Ya girîng ji bo pêvajoyê pêkanaîna mafê hêviyê ji bo Rêber Apo û guhertina makezagona Tirkiyê, hem jî dayîna mafê gelê Kurd qonaxa duyemîn e ji bo pêvajoyê. Pêwîst e ev xal werin bicihkrin. Di serî de jî divê mafê hêviyê ji Rêber Apo re were dayîn, ne tenê wê Rêber Ocalan ji vê biryarê sûdê werbigire, lê belê nêzî 4 hezar û 500 girtiyên sîyasî di zindanên dewleta Tirk de ne, dema Rêber Apo azad bibe ew jî dê werin rizgarkirin, bêyî vê yekê rewş dê zehmet be.”

# ‘Ciwan dikarin ji yekîtiya netewî re bibin pêşeng’

**Esma Mistefa**

**Endamê Meclisa Ciwanan a Partiya Demê Rêzan Kaginarslan da zanîn ku heger ciwan pêşengiya rast ji rewşa heyî re bikin, dikarin ji Yekîtiya Netewî re bibin pêşeng, destkeftiyên hêzên modernîteya demokratîk biparêzin û bi rêxistinbûna xwe dikarin bighêjin sosyalîzma demokratîk.**

Ciwanên Meclisa Partiya Demê li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê banga ciwanên Kurd li çar perçeyên Kuridstanê kirin ku tevlî wan bibin û ber bi Îmraliyê ve herin. Derbarê vê yekê de Endamê Meclisa Partiya Demê Rêzan Kaginarslan besiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû.

**We banga hemû ciwanên Kurdistanê kir ji bo ber bi Îmraliyê ve herin, gelo hûn dikarin zêdetir ji me re behsa naveroka vê bangê bikin, wê çawa birêve here, heyanî niha ciwanên ku tevlî vê bangê bûne û her wiha armanca we?**

Di destpêka vê bangê de me bi taybet bang ciwanên Başûrê Kurdistanê kir ku werin li Bakurê Kurdistanê û ji wezareta dadê ya dewleya Tirk re daxwaznameya hevdîtinê yê bi Rêber Abdullah Ocalan re bikin. Ji berk u di Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de, Rêber Ocalan xwedî rolekî mezin û muxatebê sereke ye. li ser vê bingehê me xwest girêdayî vê pêvajoyê fikr û ramanên Rêber Apo li çar aliyên Kurdistanê bi taybet di van ciwanan de, belav bibin. Bi taybet di vê pêvajoyê de ku çar perçeyên Kurdistabê rola xwe bilîzin, pêşengên wê perçeyan ciwan in. Di vî çarçoveyê de me banga pêşengên ciwanên Başûr kir û ciwanên curbecur bûn besiv û hatin ku daxwaza hevdîtina wezareta dadê kirin.
Şandeya me li Mêrdînê tevlî panela Avakirina Yekîtiya Netewî de rola Başûrê Kurdistanê bû. Ev bang weke pirekê di navber ciwanên Kuridstanê de ye. Em daxwaz dikin ku hemû ciwanên Kurdistanê tevlî vê bangê bibin û rasterast bi Rêber Apo re bimînin.

**Li kêlek xebatê ku aliyên kurd û komîsyona ku hatiye avakirin li Bakurê Kurdistanê, gelo xebatê ciwanên Kurd hat birêvebirin. Di encamdana pêvajoyê de çiqas bû bersiv?**

Bi pêvajoyê re me jî dest bi rêxistinbûyîna xwe kir, bi meşa amarayê me dest pê kir. di asta raman, bîrdozî û çalakî de em ji vê pêvajoyê re bibin besiv. Şandeyek me ji bo xebatên dîplomatîk ji bo avakirina yekîtiya netewî hate avakirin. Şandeyek ji ciwanên Ewropayê ji bo daxwaza hevdîtinê hetibûn. Ciwanên Bakur derfetên heyî ji bo birêxistikirinê bikar tîne, em hewil didin bibin bersiv, gel û ciwan dikarin bi rihetî nêzî pêvajoyê û ramanên Rêber Apo. Li bajarên Tirkiyê ciwan diherikin, xwe dighînin me û daxwaza cihgirtin û rêxistin kirinê dikin. Di heman demê de ji bo rêxistina civakê jî di komîn, meclis û koparatîvan de xebatên me yên çandî didomin.

**Di çarçoveya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de yekbûna ciwanan çiqas girînge û hûn çawa dinirxînin?**

Helbet yekîtiya gelê Kurd di pêvajoya şerê cîhanê yê sêyemîn de girîng e, weke Rêber Apo pênase dike di şerê cîhanê yê sêemîn de ku navenda wê Rojhilata Navîn e, divê hêzên modernîte demokratîk, destkeftiyên xwe biparêzin. Em jî



weke gelê Kurd û Tevgera Azadiyê divê ev hêz were rêxstinkirin. Rêber Apo dibêje “Sosyalîzim civakbûyîne, civakbûyîn jî bi rêxistinbûnê pêkan e” . Ji bow ê jî divê hemû gelê Kurd di vê serdemê de xwe birêxitin bikin, vê şêwazê rêxistinkirinê dikarin bibin Kongreyekî Navndtewî. Di vê yekîtiyê de rola ciwanan, hişmendî û nûbûna wan gelek girîng e. Ji bo wê em dibêjin hesabên berê yên ku mane dikarin pêşiya pêvajoyê bibin asteng lê hêza ciwanan dikare bibe bersiv. Heger Ciwan pêşengiya rast ji rewşa heyî re bikin, dikarin ji yekîtiya Netewî re bibin pêşeng, di şerê cîhanê yê sêyemîn de destkeftiyên hêzên moderinîteya demokratîk biparêzin û bi rêxistinbûna xwe ya netewî dikarin bighêjin sosyalîzma demokratîk.

## FENER



### Bi zanîna jêdera propagandayê re mesaj tê naskirin!

**Idrîs Henan**

Propaganda şêwazek ragihandinê ye ku ne tenê agahiyên ber dest, lê gelek caran agahiyên hilbijartî dide rûniştandin ku bi hêsanî rûyê ferd û civakê ber bi rêyeke berê hatiye diyarkirin dizivirîne. Ango agahî û armanca wê ji hev tên veşartin û ji nû ve li gorî armacek berê destnîşankirî tê vesazkirin.
Propaganda jî him pozîtîf û him negatîf dibe. Yanê dikare bikeve xizmeta berjewendiyên bilind ên gel û netewan, him jî dikare bikeve xizmeta elîteke çewsîner. Dikare mesaj giştî ji bo hemû kesan be, dikare dijberî hinek fikrên ku propaganda dixwaze li dijî wan derkeve û weke xerab werin hesibandin û jê were tirsandin. Di encamê de her aliyek li gorî berjewendiya xwe bi kar tîne. Desthilatên li ser şopa Hîtleran hewl didin raya giştî kontrol bikin û fikirîna civakê destser bikin, agahiyan berovajî bikin û biçewsînin. Vê yekê jî bi rêya Tv, Radyo, Rojname, Sînama, Pirtûk û îroj Internêtê dikin ku sûc, komkujî, qirkirin û holokostên tên kirin rewa bikin.
Nexşeya têkîliya ku navbera jêderê û raya giştî de ava dibe, taybetiya mesajê û armancên propaganda diyar dike. Bi gotinek din; dixwaze mesaj siyasî, civakî, aborî, şexsî be yan jî dixwaze reklam be, di hedef de guhertina baweriyê, şêwazê wê û rêya hilbijartî nîşan dike. Lew re jî xîtabên nefret û sorkirinê li ser van bingehan tên veavakirin û pêkhateyên etnîk û olî tînin rûbirûyî hev. Yanê li gorî wê armancê gel hatiye sorkirin û çiqarên desthilatê yên rasteqîn hatine nixumandin.
Eger armaca propaganda motîvekirina pozîtîf be ku civakê li dijî xeteriyan amade bike û xebata hebûnê bilin bike, wê çaxê erênî dibe. Lê eger ji bo berjewendiya kesan be, wê çaxê berovajîkirin û xapandina mezin e ku paşperdeya wê qirkirina otorîteyê veşartiye.
Ji ber van xisûsên metirsîdar divê mirov çavkaniyên xwe yên agahiyê zêde û cuda bike, dîsa divê agahiyan kontrol bike û bi pê keve ka yê belav dike kî ye? ji bo çi ye? da ku karibe mesajê bixwîne û berê wê yê rasteqîn nas bike. Têgihaştinek bi vî rengî, asoyên nirxandin û şîroveyê li gel mirov û civakê firehtir dike ku sûd û ziyanê bi hêsanê ji hev derdixe. Mekanîzm û amûrê ku mesaj pê tê şandin werin naskirin, sûd û zirarên propagandayê jî tên zanîn.
Di encamê de, em di demekê de ne ku ragihandina klasîk û dîjîtal bûne amûreke nevendî ya şerê siyasî û derûnî. Da ku aqilê giştî li gorî xwe bidin avakirin, rastiyê berovajî bikin, destkeftiyên siyasî, leşkerî, aborî û otorîteyê qezenc bikin, bi awayê Hîtlerwarî hemleyên nefret, sorkirin û berovajîkirinê weke gerdişekê hatine roja me ya îro. Lew re jî em dibînin ku îro li qadeke weke ya Sûriyê, şîdet, tundrewî, teror û dijatî heye ku piştevaniyê dide kuştin û komkujiyan. Zarokan tên bikaranîn û dijwarî nav wan de belav dibe. Ji telîfonê bigire heya malperên tevna civakî were, bi navê ol û netewperestiyê, bi rêya film û rêzefîlmên biyanî, lîzkên tund ên dîjîtal, pêşerojeke ferazî ya xapînok ava dikin û ferdên civakê dehfî Holokostên nû dikin. Bi vî awayî jî beşên civakê dûrî misyona bingehîn dixin, bê erk dihêlin, paşguh dikin ku zemîna belavkirina fikrên jirêderketî, biyanî û yên tundrew bi rêk û pêk tê avakirin.
Bê guman bi çend gotinan ev mijar nayê vegotin, lê tişta girîng ew e mirov tê bigihêja ku parçebûn û aloziya li Sûriyê û herêmê tên jiyîn, ji ber nebûna ragihandinek azad ê pîşeyî ye ku rê li ber belavbûna xîtabên neferet û sorkirinê bigire û roleke navendî di têkoşîna li dijî propagandayên reş ên negetîf de bilîze ku ji gotinê wêdetir, bi realîteya gelên Sûriyê ya demokratîk û pirrengî re bibe yek û pêşengtiya pêkvejiyanê bike.



# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsiv**

Hunermend Şiyar Agirî
“Stûneke hunerî ya bilind û nîşaneke muzîkî ya bêhempa “
Hunera Kurdî ya Hemdem, di bin şertên dîrokî û siyasî de ku gelê kurd têre derbas bûye,yek ji şêweyên herî berbiçav ê berxwedana çandî û rêyên parastina nasnameya neteweyî ye. Li hember hewildanên jêbirin û pijavtina
birêkûpêk û sîstematîk, hunermendên kurd ziman, bîr û hestên gelê xwe parastin, stranên wan yên ku ji folklor , êş û xemên welat wergirtibûn , di parastina çanda devikî, belgekirina bobelatên civakî û di pêk anîn û xurtkirina têkildariya neteweyî de rolê girîng lîstin.
Ji nav van dengên berxwedanê de, hunermend û muzîkjen Şiyar Agirî xuya dike, ku roleke girîng lîst di parastin û pêşxistina mîrateya hunerî ya kurdî de ,bi rêya awaz û stranên xwe, wî hewl da ku ji nû ve ruh bidê muzîka kurdî, wî amûrên muzîkî yên nû daxistin, û ji nû ve bi ruhê hemdemî awaza kurdî vehûnand bêyî ku girêdana wê ji kokê wê qet bike

Bi saya vê hevsengiya di navbera resenî û pêşketinê de, navê wî bû yek ji nîşaneyên guherîna afirîner a di rêya muzîka kurdî ya hemdem de.
Li bajarekî piçûk bi navê Amûdê, hunermend, awazdêner û muzîkarê Kurd Şiyar Agirî di navbera zeviyên ku genim û stran bi hev lê şîndidin hate dinyayê.
Bajarê nivîskar û helbestvan û afirîneran, yên ku barê peyv û xewna azadiyê li ser milê xwe hilgirtîn, wekî Selîm Berkat û Cemîl Rawî; û derkûşa romanên ku Heysem Husên û Tofîq Husênî hûnandî û her weha wargehê hunermend û stranbêjên kurd ên wekî Rifat Darî û Yûsif Çelabî û çavkaniya hunera kurdî a resen ku ji wê awazên azadiyê û bîhnxweşiya mîrasa têne vejandin, di Amûdê de, ku şaristanên dîrokê bi nalînên axê re hev himbêzdikin , û alayên lihevhatin û hevjiyanê di navbera ol û ayînan de bilind dibin, Şiyar Agirî mezin bû, mîrasek çandî û mirovahî ya dewlemend dabû ser milê xwe.
Wî zarokiya xwe di nav kolanê kevnar ên Amûdê de derbaskir, di hilmijî bîhnxweşiya paşerojê, û guhdarî vedenga bobelata sînemaya Amûdê ya şewitî dikir, ew felaketa ku hînî xweliya wê çîroka canên bêgune yên ku hatin şewitandin û xewnên ku berî ji demê xwe hatine kuştin dibêje,li wir, di nav kavilên sînemayê û bêhna xweliya laşên kizirî de Şiyar fêm kir ku huner ne şehyane, dengê êşê ye, qêrîna rastiyê ye û bîranînek ku qet na mire.
Li bin sîberên pêmayên Girê Mozan, Şermola û Şaxir Bazar, û li ber ringeringa zengilên Dêra Mar Elyas, hinêra jenandin tembûrê û stranbêjiyê di nav ruhê wî de hişyarbû, dest bi tomarkirina awazan kir, ji hestên cîgehê, û hesreta gelê wê, ji dengên sirûdên mizgefta mezin û axaftinên gel di bazar û qehwxaneyan de wî awazên ruhê kurdayetiyê vehûnandin.
Di zarokiyê xwe de, guhdarî stranên dayikan, qêrînên dewatan û lawikên kurdî yên ku ji devên cotkar û gundiyan derdiketin dikir , wê jîngehê



di hundirê wî de bingehek çêkir berî ku yek awazî biafirîne, ji ber vê yekê, stranên wî bûn neynikek ji bo çîrokên belengazan,
axînên sitembaran û xewnên azadxwazan, ku rûmetê diparêzin û ji bo azadî stranan dibêjin.
Şiyar di nav jîngeha tije ji çîrok û afsaneyên ku di bîra civakê de hatibûn xêzkirin , mezin bû; li wir stran ne şehyanek bû, lê amûrek bû ji bo vegotin , berxwedan û jiyanê di heman demê de.
Hunermend û muzîkjenê kurdî Şiyar Agirî di sala 1974’an de li bajarê Amûdê ji dayîk û bavek kurd (Abdurahman û Hezbiya) hate dinyayê , di malbateke welatparêz û kedkar de, ku ji heşt zarokan pêktê (çar kur û çar keç) mezen bûye.
Di himbêza vê jîngeha resen de, ew li ser hezkirina xakê û girêdana bi nirxên Kurdayetî û dilsoziya bi ruhê welatparêziyê hate firşik kirin , ku bingehên nasnameya wî û cihnîşa rêwîtiya wî ya hunerî afirandin .
Hewsa wî ya hunerî û eşqa wî ji bo muzîka kurdî dest pê kir di temenek piçûk de, ku hîn heşt sal derbas nekir bû, di bin bandora jîngeha muzîka dewlemend a ku di himbêza wê de mezin bû,melodiyan ji her aliyan ve ew dorpêç dikir, li wir, stran di meydanan de dihate gotin, ne di li ser dika şanoyan, awaz ji xuşîna sinebilên genim, ji axîna bilûran ku di hatina şevê re wenda dibû dihate afirandin,
herwiha dengê stranên folklorî û neteweyî yên kurdî, di gel hin stranên biyanî jî, bandora wan li ser pêşketina hişmendiya wî ya hunerî û xurtkirina têkildariya wî ya neteweyî hebû, vê yekê hişt ku muzîk di wijdana wî de di gel nirxên nasname û azadî tevlî hev bibe.
Wî li bajarê xwe dibistana seretayî û navîn xwend ,di destpêka xwe ya hunerî de, ew sala 1984’an de tevlî koma serxwebûn bû, û di wê demê de,temenê wî ne zêdetir ji deh salan bû,wekî muzîkarê orgê ji bo sê salan beşdarî komê bû , di wê demê de hinêra wî ya balkêş û hestê wî yê muzîkê zû nîşan dan, di sala 1987’an de, ew yek ji damezrênerên despêkê yê koma Agirî -Amudê bû ,ku nîşaneyek girîng di meşa wî û destpêka rêwîtiya wî ya hunerî ya rastîn de ava kir û rolek girîng lîst di ronîkirina dîtina wî ya hunerî de ,Şiyar di hate nasîn bi jêhatîbûna xwe ya li ser çend amûrên muzîkî, wekî Org, Baglama, Ûd, Tembûr û yên din, ku li berhemên wî cûdabûn û dewlemendîyek zêde kir di dabêşkirin û sazkirina melodiyan dehişt ku ew bibe dengekî muzîkî yê bêhempa di dîmena kurdî de.
Rêwîtiya wî ya hunerî di temenek piçûk de destpêkir û ew ji kesên destpêkê bû ku amûra ‘baglama’ derbasî muzîka herêma xwe kir , di sala 1990’an de, li Amûdê di Stûdyoya Dîlma de xebit, û di sala 1994’an şûnde jî li Helebê di Stûdyoya Agirî de kar kir, ew ji yekemîn muzîkjenên Rojavayê Kurdistanê tê hesibandin ku têgeha “Belavkirina Muzîkî” ya nûjen aniye nav stranên kurdî, bi bikaranîna amûrên muzîkî yên nû wekî “Keman, ûd, ney, kîtar û pîyano”, û herwiha bi kar anîna amûrên ku di stranên kurdî de ne hatibûn nas kirin, mîna Kaltşîllo û saksefon di gel baglama û defê, di dema ku stran bi awayekî despêkî, bi derbik û tembûr tenê dihate tomarkirin, wî giyanek nû da strana kurdî bêyî ku ew dest bavêje nasnameya wê ya kelepûrî ,da ku bihêle ew nêzîkî nifşek nû bibe bêyî ku ew ji kokên xwe qut bibe.
Wî hevkarî bi gelek hunermendên kurd û komên hunerî yên kurdî li Sûriyê, Lubnan û Tirkiyê kiriye , çi bi tomarkirinê, an Belavkirina muzîkî û an jî bi piştgirtî û lêxistina amûrên mûzîkê bi rengekî zindî, mîna : “Şivan Perwer, Aram Tîgran, û Gulistan Perwer, Xelîl Xemgîn, Cemal Tîrêj, Şemdîn, Beser Şahîn, Xemgîn Bîrhat, Mihemed Ezîz Şakir, koma Cudî, komê Agirî ya Helebê, koma Botan û koma Agirî ya Amûdê, û hwd.”
Hunermend Şiyar beşdarî gelek şevbuhêrkên muzîkî, konserên neteweyî,
pîrozbahiyên niştimanî û festîvalên hunerî bûye,bi taybetî di pîrozbahiyên Newrozê de , hebûneka wî ya cûda hebû bi şêwazê xwe yê şarezayî û amûrên muzîkî û stranên xwe yên xweşdeng ku diherikîn dilê temaşevanan .
Di dema rêwîtiya xwe ya hunerî de, Şiyar Agirî heft albûmên stranan weşand, ku di nav wan de zêdetirî ji pêncî stranan hene, Mijarên wan jî cûrbecûr bûn: ji nasname û berxwedanê heta evîn û welat tê de hebûn.
Wî ji bo şoreş û şoreşgeran stran got, ji bo jinê wekî sembola têkoşîn û dayînê, ji bo azadî û rûmetê ,her weha ji bo bedewiya Kurdistan û xweşiya xwezayê wê stran got, stranên wî bûn neynika hest û hisên gelê wî ,û dengek zindî bo pirsgirêkên wan û nebezek rasteqîn ji bo xewn û hêviyên wan.
Ji navdartirîn stranên wî :
1- Hikmeta Xwedê (Peyv: Ehmedê Xanî, Awaz: Şiyar)
2- Dilib Sê Lib (Peyv û Awaz: Şiyar)
3- Hucra Tarî (Peyv û Awaz: Îbo Amûdî)
4- Sebra Min (Peyv û Awaz: Şiyar)”
Rêwîtiya wî tenê di jêhatîbûna jenandina amûran de, an dabêşkirina muzîkî ya nûjen de sînordar nema, lê her weha wî dest bi nivîsîn
û awazkirina gelek stranên kurdî kir û bi şêwazê xwe yê taybetî hûnandin, di nav wan de ruhê folklorî û hestê nûjen tevlihev kirin.
Ji navdartirîn stranên ji gotin û awazên wî:
1- Bejna Delal
2- Ez yê te me
3- Evîn
4- Cotê Kewa
Wî nivîsî û awaz çêkirin ne ji bo ku falehiyeka pêşesaziya muzîkê de dagire, lê ji bo bêje tiştên ku tenê bi awazê tên gotin, ew li muzîkê dinêre wekî zimanekî li şûna peyvan, û di her parçeyek dengî de beşek ji nasnameya neteweya xwe diçîne û awazê dike wekî balyozek bo nasnameyê, û ritmê dike wekî sirûdek bo azadiyê.
Wî bi dehan vîdyo -klîbên stranbêjîyê pêşkêşkir pê pirtûkxaneya hunera kurdî dewlemend kir bi riya stran û muzîka xwe ya afirînerî , ku tê de hestê hunerî bi hişmendiya neteweyî tevlihev dibe û bedewiya melodiyê bi kûrahiya peyamê re li hev dicive .
Ji klîbên wî yên herî navdar:
1- Şefqa me (gotin: Derwîş Mela, awaz: Şiyar)
2- Bejna Delal (gotin û awaz: Şiyar)
3- Çiyayê Agirî (gotin: Xoce Ferec, awaz: Şiyar)
4- Hatın û Çûn (gotin û awaz: Şiyar)
5- Ber Pencerê (gotin û awaz: Şiyar).
Şiyar Agirî sala 2015’an ji Rojavayê derket, dema ku axa welatê wî veguhêrî qadeka şer û xwînê û bû penahek bo çekdar û çeteyan, ew bi rêket û di dilê xwe de hildigirt hesteta welat , û ji çavên wî rondikên bêrîkirinê dibarîn û li paş xwe hişt zarokatîyek bi bîranînan xemilandî û kesên ku ji wan hezdikir, û hîn jî di hundirê wijdanê wî de dijîn, ew demek kurt li Tirkiya ma , û paşê li Almanyayê bi cihbû, lê derbiderî û sirgûnê nekarîn muzîkê ji dilê wî derxînin, û nekarîn agirê ku ji zarokatiyê de di giyanê wî de hatibû dadan vemirînin , xurbetê
bi hemû zehmetî û zoriya xwe jê re bû êzingek ku şemaya rêwîtiya wî ronî kir, û israra wî ya li ser berdewamî û afirînerî yê zêde kir, da ku dengê wî bimîne vedengek zindî
ji bo welatekî ku rojekî qet ji dilê wî dûr nebû herçiqas ku herêm û dûriyan wan ji hev veqetandibûn.
Li wir wî projeya xwe ya muzîkî ‘Stûdyo Agirî’ damezrand , taybet ji bo hilberîn û belavkirina muzîkê, da ku bibe penahgeh ji dengên nû yên kurdî û minberek ku mîrasa muzîkê ji wendabûn û ji bîrçûnê biparêze.

Şiyar ne tenê hunermendek, an jî awazdênerek , an jî muzîkjenek pispore ,lê ew dibistanekî rastîn a hunerî ye; ku ji pizdanka serpêhatiyan hatiye afirandin, ji têkoşîna bîrdanka kurdî firşik bûye, û herî dawî bûye çavkaniyek ji bo kesên din.
Gelek hunermend ji dibistana wî ya bêdeng derçûn , ku strana kurdî bi dengên xwe yên ciwan parastin , û rengên nû li dîmena muzîkê zêde kirin, lê hemû vedigerin wê dara hêviyê ku Şiyar li Amûdê çandiye.
Bi şêwazê xwe yê hemdemî di dabeşkirin û awazdariyê de, û bi hewlên xwe yên berdawem ji bo dîtina hinêrvanên ciwan û hevkarî kirin bi sembolên stranbêjiya kurdî yên xoştivî re, Şiyar Agirî bû sembola nûjeniyê ku bi kokan re têkildar e, ew pira qewîm ya ku xezneya bîra gelêrî ya Kurdî û bi daxwazên nifşên nû ve girêdide.
Wî folklora kurdî li ser milên xwe hilgirt, ne wek barekî giran, lê wekî mîratek pîroz ku hêjayî bedewkirin û nûvekirinê ye, bi rastî ew yek ji wan çend kesên despêkê bû, ku hunera kurdî bi rastî kirine neynikek ronahî ya nasnameyê û ruhê berxwedanê di rûberûya bîranînê de.
Daxwazên min ji bo wî di kariyera wî ya hunerî de serkeftin û afrînerîyek zêdetir.



## Cejn

**Remezan Olçen**

Di dîroka milletan de cejn rojên xwedan wate û giring in. Rojên şadî û bextewariyê ne. Serketinê destnîşan dikin. Ji serdema mîtîk û mîtolojîk heta roja îro wisa ye. Hesta ku cejn bi mirovan re çêdike jî heqeten êdî ketina nav xwîna li nav tamarê me, dil û mêjiyê mirovahiyê.
Beriya serdemên qewmiyetê jî cejn hebûn. Cejna biharê cejna hilanîna dan, mehsere û hwd. Bi qewmiyetê re jî cejn çêbûn. Bi dîn û baweriyan re cejn çêbûn.
Cejn rengîniya mirovahiya li cîhanê ye. Erê rast e di serdema qewmiyetê de cejna qewmekê bûye şîna qewmeke din lê dîrok car bi car nîşan daye ku cejna qewmekê ji aliyê gelek qewmên din jî hatiye pîrozkirin. Mînaka vê jî jib o me Kurdan û gelên ku bi me re cîran in, 27’ê Mijdarê ye.
Min çima despêkeke wisa dirêj nivîsand, ji ber ku ez dixwazim em bi hev re hinek li 27’ê Mijdarê bifikirin. Em binêrin bê ka di nava 47 salên bihurî de 27’ê Mijdarê çi li jiyana me zêde kiriye. Êiqas nirx li me zêde kirine… Ez dixwazim em bi hev re lê bifikirin. Em lê bifikirin, ez bawer dikim ku em ê bibînin ku çima me nave vê cejnê daniye Cejna Berxwedanê. Berxwedaneke welê ku kesî bêrumet û sernetewandî nake. Berxwedaneke ku dijminê xwe jî dike ku rêz jê re bigre. Berxwedaneke ku dijminê xwe dide şerê lê bi rûmeta dijminê xwe nalîze. DIjminê xwe dike hijmekarê xwe. Berxwedana milletekî ku di oxira hebûna xwe de li cejnên mirovahiyê cejneke nû zêdekirî.
Avakar û çêkerên vê cejnê Rêber Apo, şehîdên dozê û bi milyonan welatparêzên Kurd û Kurdistanî ne. Ji qewmekî ku ji rastî û heqîqeta xwe direviya çêkirina qewmekî ku bûye hêviya hemû bindestan e. Berxwedaneke ku li rengîniya mezopotamyayê parastina hemû rengan e. Herçî em Kurd ji rengan pir hez dikin. Em pir jî ji Kesk û Sor û Zer. Cejna Berxwedanê cejna azadiya van rengan e. Cejneke keskesorî, cejneke mêrgeke hezar û yek kulîlkî ye. Ev cejna PKK’ê ye. Cejna jiyana nû ye. Cejna şikandina zincîr, qeyd û bendan e. Cejna Kurdê Azad e. 27’ê Mijdarê di dîroka Kurd û Kurdistaniyan de werçerxekê destnîşan dike. Destwerdaneke li dîrokê ye. Cejna Berxwedana Neteweyî pîroz e, bila pîroz be.

# Hişkesaliya Kurdistanê û bandora wê li ser jiyanê

Li Kurdistanê, her ku diçe bandora hişkesaliyê bêtir xwe nîşan dide. Sûlav û çemên ku bi salan e diherikin, ji ber kêmbûna baranê zûwa bûn, di heman demê de xeteriya li ser berhemên çandiniyê, ajalvanî û xwezayê zêde dibe.

**Biruc Resûl/Qamişlo**

Hişkesalî diyardeyek xwezayîye ku dibe sedema xirabûna rewşa aborî û civakî. Hişkesalî ji ber kêmbarîna berf û baranê çêdibe, dibe sedema kêmbûna berhemên çandinî û lawirvaniyê, di heman demê de xwezayê jî têk dibe.

Li Kurdistanê, her ku diçe bandora hişkesaliyê bêtir xwe nîşan dide. Sûlav û çemên ku bi salan e diherikin, ji ber kêmbûna baranê zûwa bûn. Tê dîtin ku di çeman de av jî nemaye. Herwiha nebarîna baranê û germa zêde jî bandoreke mezin li şînatiyan dike.



### Hin mînakên hişkesaliya Kurdistanê:

Li navçeya Elkê ya Şirnexê ku bi sulav, zozan û çemên xwe bi nav û deng e îsal hişkesalî xwe bi her awayî nîşan dide. Li gundê Gelejêrê yê navçeyê ku sulav lê heye, ji ber hşkesaliyê ava sulavê gelek kêm bûye. Welatiyên ku bi ava sulava Gelejêrê bax û baxçeyên xwe av didin, îsal ji ber kêmbûna avê rojên zor û zehmet derbas dikin.

### Çemê Nerdûşê qirêj diherike

Şirnex ku bi talankirina xwezayê û birîna daran her tim di rojevê de ye, bi avakirina kanên komir, xîz û lêgerîna petrolê hewa û çemên wê jî tên qirêjkirin. Kanên komir û madênên cuda ku ji aliyê aligirên desthilat û sermayedarên herêmê vê hatine çêkirin, wendahiyeke mezin didin xwezaya herême. Şîrketa Bolunmez Enerjî ya Suleyman Bolunmez ku li ser rêya û Şirnexê kana komirê çêkiriye dibe sedema qirêjbûna Çemê Nerdûş. Çemê Nerdûş ku ji bin çiyayê Cûdî diherike ji ber av û gemara kana komirê dikeve nava çem qirêj dibe û wek heriyê diherike. Li gor gotinên şêniyên gund Çemê Nerdûşê beriya kanên komirê zelal diherikî û di nav de gelek masî hebûn e. Lê niha di dîmenan de jî xuya dike ku çem bi awayekî qirêj diherike û qirêjiya kanên komirê jî di nav çem de diyar dibe. Bi qirêjbûna çem re êdî masî jî di nav çem de nemane û dimirin. Dema me li wir dîmenê çem digirt, şivanekî temenê wî hê zarok bû, pezê xwe anîbû ber çem û neçar bû pezê xwe li vir av bide. Şivan da zanîn pez vê ava qirêj vêdixwe û nexweş dikeve. Lê ji bilî vir li cihekî din av tune ye û ji ber vê ew neçar dimînin li vir pezê xwe av bide.

### Pezê gundiyan ji ber avê nexweş dikeve

Çemê Nêrdûş, ji gundên bi ser Şirnexê ve dest pê dike û heta navçeya Silopiyayê diherike û pêdiviya avê ya welatiyên herêmê dabîn dike. Lê ji ber qirêjbûna çem, ava vexwarinê ya welatiyên herêmê jî qirêj dibe û ev yek metirsiyên jiyanî bi xwe re tîne. Qirêjbûna çem ne tenê bandor li ser welatiyan dike di heman deme de ji bo sewalan jî metirsiyan derdixînê. Sewlên ku di çem de avê vêdixwin nexweş dikevin. Ji bîlî çem jî li wê derdorê cihekî ku sewal bikarin ava paqîj vêxwin tune ye. Tevî gilî û gazînên welatiyan jî lêçûnên kanên komirê re çareseriyek nehatiyê dîtin û hê jî lêçûnên kanên komirê diherikin nava çem.

### Talankirina xwezayê

Dewleta Tirk a dagirker li Bakurê Kurdistanê û li Rojavayî Kurdistanê jî mîna Efrîn bi awayekî plankirî ekolojiyê qir dike. Ji van deverên ku ekolojiya wê tê qirkirin piranî li ser Şernex û Efrînê ev yek pêk tê. Di salên 1990'î de li Şirnexê û navçeyên wê gelek gund hatin valakirin û xwezaya wê wêran kiriye. Li gundên ku bi hinceta "Ewlehiyê" hatin qedexekirin ji şîrketên madenê û kesên ku daran talan dikin re rê hatiye vekirin. Gund, çiya û warên Şirnexê ku ji welatiyên wê re qedexe ye, bûye cihê talana xwezayê û birîna daran. Birîna daran li çiyayên Cûdî, Gabar, Besta û li herêma Komete ya navçeya Elkê heta çoltera gundê Elemûnê ya navçeya Qilebanê belav bû. Ji bilî birîna daran jî xwezaya Şirnexê bi destê şîrketên madenê tê talankirin. Bi heman rêbazê ji 2019`an û heya roja îro li ser Efrînê ev kiryar û talankiran xwezayê tê kirin, dewleta Tirk û çeteyên wê bi hezaran darên zetûnan li Efrînê birîne ku hewil dide Efrîn veguguherîne çolistan.

### Çemê Diclê

Li ser Çemê Diclê yê navçeya Cizîrê gelek kanên xîzê hatine vekirin. Tevî ku Wezareta Hewirdor û Bajarvaniyê di 8'ê Kanûna 2007'an de destûrdayina vekirina kanên xîz û xîçê batal kiriyê jî li ser Çemê Dicleyê kanên xîzê tên vekirin. Kanên xîzê ku ne ruhseta wan heye û ne jî destûra wan a ÇED'ê heye nayên girtin û xebatên xwe berdewam dikin. Kanên xîzê jiyana zindiyan û xwezayê jî dixe xetereyê. Kana xîzê ku li ser çemê Dicleyê ya nezî li taxa Çemkûrk a navçeya Cizîrê rê li ber xetereya jiyana mirovan û sewalan vedike. Ji ber xebatên kana xîzê çem kûr bûye û welatiyên ku dixwazin bikevin çem jî bi xeniqandinê re rû bi rû dimînin.

### Hişikesaliya li Rojhilatê Kurdistanê

Talava Kanî Berazan ku 30 kîlometreyan li bakurê rojhilatê Mehabadê ye, bi temamî hişk bûye û dilopek av jî tê de nemaye. Ev hişkesalî ne tenê ziyaneke mezin gihandiye sektorên çandinî, ajaldarî û geştyariyê li herêmê, lê di heman demê de bûye sedema fikarên kûr ên jîngehparêzan. Ev talava ku jîngeha bi hezaran balinde, ajalên kûvî û gelek corên masiyan bû, niha bûye çolistanek. Beşek ji zindeweran ji ber bêaviyê telef bûne, beşekî din herêm terikandine û yên ku mane jî di bin metirsiya tunebûnê de ne Li hemberî vê karesatê, gundiyên deverê dest bi hewldaneke mirovî kirine. Wan li navenda talavê çalek kolane û bi pompekê ava vexwarinê ji bo balinde û ajalên ku mane dabîn dikin. Talava Kanî Berazan, di dema ku têr av bû, xwedî rûbereke 1050 hektarî û kûrahiyeke 60 santîmetreyî bû. Ew stargeha 180 corên balindeyan û gelek corên ajalên din bû. Hinek ji van balindeyan, weke Werdeka ser spî, Werdeka mermerî û Zîqawle, ji berê de di bin metirsiya tunebûnê de bûn. Niha bi hişkbûna talavê re, jîngehparêz ditirsin ku ev corên nadir bi temamî ji holê rabin.

### Zêdebûna gazên jehrî dibe metirsiya tuşeya nexweşiya penceşêrê

Guherîna avhewayê di çend salên borî de gelek zêde bûye û pileya germahiyê bilind bûye, bandorê li zevî, mirov û lawiran kiriye. Sedema bandora bilindbûna pileya germahiyê toz û kêmbûna avê ye. Kêmbûna avê ku em îsal hîs dikin, van diyardeyan bi çavên xwe dibînin. Ev yek hişkesalî ye ku ji ber şer û wêrankariyê û zêdebûna wesayîd û amûrên veguhestinê û dumana wan e. Zêdebûna hejmara rûniştvanan hemû bandorê li ser bilindkirina pileya germahiyê kiriye û zêdebûna rêjeya gaza jehrî di zeviyan de pileya germahiyê zêde dike. Ji ber bilindbûna pileya germahiyê û kêmbûna avê, gelek nexweşiyên bakterî û vîrus, bi taybetî di werza havînê de belav dibin. Zêdebûna gazên jehrî di nava hewayê de dibin sedema metirsiya nexweşiya penceşêrê.

### Hişkesaliya li Qendîlê

Her wiha niha Qendîl jî di hişkesaliyeke gelek dijwar de derbas dibe. Sala 2025'an de ku ji ber kêmbarîna baran û berfê bandorek zêde li çavkaniya avê kiriye, rûbar gelek kêm bûne, vê yekê jî ji bo rûniştvanên Binarê Qendîlê gelek pirsgirêkan bi xwe re aniye. Dibe sedem ku rûniştvanên Binarê Qendîlê nikaribin li gorî pêwist e kar û barên xwe bikin. Debara jiyana xelkê vê herêmê li ser çandinî û lawirvaniyê ye. Hişkesalî û guherîna avhewayê, bandorek zêde li ser Binarê Qendîlê kiriye. Gelek bîrên ku hene, ger zuha bibin û av kêm bibe, xelk dê nikaribe sûdê ji wan bibîne, ji ber wê dibe sedem ku bax û baxçe hişk bibin. Di heman demê de em ev dibe sedemeke neyinî li ser çandiniyê û aboriya civakê.

### Li Rojavayê Kurdistanê zeviyên çandiniyê di bin metirsiya windabûnê de ye

Zeviyên çandiniyê yên Rojavayê Kurdistanê, ji ber kêmiya baranê, berhemên çandiniyê di jêr metirsyiê de ne. Ji sedî 70`ê ji zeviyên çandiniyê li Rojava, zêdetir bi berhemên genim, ceh, nîsk, pembû tên çandin. Ji ber hişkesaliyê ev nêzî 2 sal in welatî rastî ziyaneke mezin tên.



# 'Serdana Koşka Spî ne serkeftinek bû, lê beşek ji Peymana Ibrahîmî ye'

Endamê Meclisa Giştî ya Partiya Yekîtiye Demokrat PYD'ê Welîd Dîngilî da zanîn ku hêzên global ji bo guhertina nexşe û pêkanîna pilanên xwe, pêwîstiya wan bi amadekirina Ahmed El-Şeri heye û got, "Yekem serokê Sûriyê li Koşka Spî rûdine, ne serkeftine, pêkanîna beşek ji peymana Îbrahîmî ye."

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Ji kujer û terorîstekî ku li ser destê El-Qayîde mezin bûye, di roj û şevekê de bû berpirsyarê welatekî. Bi nêzîkbûna temambûna salekê li ser hatina hikumeta veguhên û serweriya Ehmed El-Şeri(Colanî) li Sûriyê. Endamê Meclisa Giştî ya PYD'ê Welîd Dîngilî bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû.



**Piştî rûxîna rêjîma Bass, HTŞ'ê hat li ser desthilatdariya Sûriyê û bi awayekî yek alî bêyî tevlîbûna pêkhateyên Sûriyê hikumet ragihand, piştre li du hev komkujî li berava Sûriyê û Siwêdayê pêk anîn û heta vê kêliyê jî di kiryarên xwe de berdewam e. Hûn vê siyaseta hikumeta Sûriyê ya ku xwe dispêre inkarkirin û qirkirina gelan çawa dinirxînin?**

Piştî rûxandina Rêjîma Baas a Sûriyê û hatine hikumeta veguhêz bi serpereştiya Ehmed El-Şeri, hikumetekî netewperest ku berdewamiya hikumeta Baas dike dest pê bû. Helbet dewlet-netew jî înkar û qirkirina netewên din dimeşîne, ji ber ku zihniyta dewlet-netew xwe bi tenê dibîne. Her wiha yên ku muxalîf derdikevin, ew rastî qirkirina îdeolojîk, fîzîkî û cenosaydê tên.

Helbet hikumeta veguhêz jî tu guhertin nexistin xeta Rêjîma Baas, li ser wê xetê desthilatdariya xwe da meşandin. Tenê tişta ku hatiye guhertin ji malbata Baas bû malbata El-Şeri. Siyaseta ku di hundir Sûriyê de dimeşîne weke siyaseta Baas e û jê tujtir e. ji ber di komkujiyên ku pêkanîne de, di tu serdeman û bi taybet di serdema heyî de nayê qebûlkirin. Ev yek tam dişibe ew ceng û şerên Ereban yên serdemên navîn ku çawa bajar fetih dikirin. Ew zihniyet niha careke din tê pikaranîn ûû bêyî ku eniya wan xwîdan bide zarok, jin û gel di qetlîaman re derbas kirin. Ev yek jî di bin çavên raya giştî, kesên ku dibêjin em demokart û mavê mirovan diparêzin de hate kirin. Ev kiryar, komkujî û piratîkên hikumeta heyî werin cezakirin û hesab bê xwestin.

**Tevî ku Ahmed El-şeri(Colanî) salên dirêj di nava DAIŞ û Al-Qayidê de maye û navê wî li ser lîsteya terorê ya meclisa ewlehiya navdewletî hebû, lê herî dawî ew wekî serokê welatekî ji aliyê DYA ve hat vexwendin û li Koşka Spî bi Trump re hevdîtin kir. Tu vê siyaseta ku Amêrka û dewletên rojavayî ku li Sûriyê didin meşand çawa dinirxînî, demikî ye an stratêjîke û armanc jê çi ye?**

Em dizanin ku Ehmed El-Şeri ji ku hatiye û îdeolojiya xwe ji ku wegirtiye. Ev kes ji torabora MÎT'ê hatiye, ji fikra Eymen El-Zawahêrî, Usama Bin Ladên û fikrekî Îsalamî ya tund ji rastiya Îslamê dur e, hatiye. Ji ber Îslama demokratîk ne wisa ye. Ev kes derçûya van kes û zihniyeta ye, yek ji kesên ku ji dibistana Usama Bin Ladên derketine ye. Helbet ev kesên ku di Efganistan û Rojhilata Navîn de li hember siyaseta Emerîka şer dikirin, ev kes ketin nav lîsteya terorê ya cîhanê. Lê xuyaya ku kesayeta Ehmed El-Şeri hinek cuda bû. Piştî ku ferza Colanî hat çêkirin ku li cografiya Îraq û Sûriyê oparasyon terorîst û kiryaran bike, ev kes kete hedefa istixbarata cîhanî û karekterê wî hat qebûlkirin. Herwiha li Îraqê kete hepsê. Li gor ku tê gotin ku ev kesayet ji aliyê istixbarata Giladiyo, Israyîl, Birêtaniya û hwd ve baş hatiye perwerde kirine da ku rola xwe di Buhara Ereban de bilîze yê ku wan daye avakirin da ku Rojhilata Navîn biguherînin.



Hêzên global di guhartina nexşe û pilanên xwe de pêwîstiya wan bi amadekirina van kesan heye. Yek ji wan jî kesayeta Ehmed El-Şeri bû ku ji bo Rêjîma Esed hatibû amadekirin. Di heman demê de ev kes xistibûn lîsteya terorê ku ji bo Emerîka gereke û 15 hezar dolar ji bo girtina wî weke muqabil diyar kirin. Dema em bala xwe didinê bi ketina Rêjîma Baas re, bê şerkirin, bê xwîdan dayîn ev kes hat û bû serokê desthilatdariya Sûriyê. Ev bûyer ne ji ber xwe ve diqewimin. Ev tişt ji aliyê hêzên netew-dewlet ve saz kirî ne. Ji bilî vê rûxmî ku Emerîka serê wî dixwast, lê belê li Erebistana Siudiyê li hev rûniştin. Yên ku ev hevdîtin lihevanîn jî, Mihemed Bin Selman û Erdogan ku bûn navbeynkar ji Colanî re. Piştî hevdîtinên bi Erdogan re jî, em dibînin ku li Koşka Sipî Ehmed El-Şeri û Troump li hev dicivin. Di dîroka Sûriyê de cara yekemîne serokek ji Sûriyê diçe li Koşka Sipî rûdine. Ev yek ji bo gelê Sûriyê weke serkeftinekê hat dîtin, lê di rastiyê de ev ji bo pêkanîna beşekê ji Itifaqa Ibrahîmî ye.

**Piştî serdana Ehmed El-şeri ji Waşingtonê re, hat xuyakirin dosiya Sûriyê bi giranî ket bi destê DYA, wê ev yek çi guhertinê li ser destwerdana Tirkiyê di Sûriyê de bike û ihtîmal heye ku Tirkiyê siyaseta xwe bugherîn?**

Piştî ziyareta Ehmed El-Şeri ji Waşingtonê re, dosya Sûriyê êdî bi destê Ermerîka ket. Ev jî guhertinên gelek mezin wê bike hundir Sûriyê û wê ji destwerdanên herêmî yên ji Sûriyê re bendekê çêbike. Lê ev yek wê çawa bibe girîng e. Helbet em dizanin ku Emerîka, Rûsiya û Israyîl li ser vê yekê lihevin. Di 24'ê Hizêrana 2019'an de ev her sê dewlet li Til Evîv rûniştin û şeklê Sûriyê bi şêwazekî stratejîk nîqaş kirin, yani wê stratejiya Ekerîka, Rûsiya û Israyîl di herêmê de çawa be, diyarkirin. Ji wê demê de ev pilansazî hatiye danîn, tenê rola demê hebû ku hinekî bisekine û ew xwarina tê amadekirin bi agirekî herî nerm çêbibe. Ya din di heyva Kanûna 2024'an re derket dema ku çira kesk ji Cebhet El-Nusra re pêxistin da ku êrişî Rêjîma Baas bike..

Xeteriya Tirkiyê li ser Rojhilata Navîn ne kêmtirî xeteriya Îranê ye. Tirk jî dibêjin ev herêm ya mine, ev bawerî û eqîdeya di serî Trikiyê de ji Îranê ne kêmtire. Ji ber vê stratejiya Israyîlê û ya Rojavayî wisa lî dinêrin, Tirkiyê jî êdî hêdî hêdî gavan paş de diavêje. Mînak; Di Lîbiya, Misir, Somal, Ezerbeycan û Sûriyê de bi bin ket her wiha wê di Qubrisê de jî bi bin bikeve. Êdê Tirkiyê wê bikeve hundir sînorên xwe, eger hidudên wî di aştiyê de jê re hêştin. Xeteriya Tirkiyê di asta giştî de ji xeteriya Îranê mezintire, çiqas bombekirin û teqînên ku Ewropa û cîhanê de hatine kirin, destê Tirkiyê tê de hebû. Tirkiyê her Ewropa tehdîd dikir ku ez ê we di penaberan de bixeniqînim, rûxmî ku Ewropa her alîkarî jê re dikir. Dîsa jî Tirkiyê rihet nesekinî li Belcîka, Firansa û li Almaniya kesayet tesfiye kirin û teqîn pêk anîn. Ev hemû jî hatine belgekirin ku dewletên navneteweyê ev dosya ji Tirkan re hilanîne û dema xwe bê wê jê re vekin.

Ji bilî vê dewleta Tirkiyê desrdirêjiyeke mezin li Îraqê dike ku di bin navê Partiya Karkerên Kurdistan PKK'ê li wir heye û şerê wan dike. Her wiha dest avêtiye tevahî Bakurê Sûriyê ku ev komkujiyên li Berava Sûriyê û Siwêdayê pêk hatine di bingeh de bi biryara Tirkiyê hatine kirin. Di heman demê de dagirkirina Serêkaniyê, Girê Sipî û Efrîn ku heyanî niha dest jê bernade. Ev pratîk siyaseta Tirkiyê eşkere dikin û wê helbet hêzên hegemon wê hed ji Tirkiyê re dîne. Guhertinên di Rojhilata Navîn de tên kirin, wê derbasî Tirkiyê jî bibin. Li gor vê demildest Tirkiyê siyaseta xwe biguherîne, ev siyaset nema dibe stratejîk û hebûna wê naparêze. Li gor me divê Tirkiyê xwe biguherîne ger neyê guhertin, wê li ber lehiya Israyîlê here.

**Eger hikumeta veguhêz a Sûriyê di kiryarên xwe de berdewam be û gelên herêmê paşguh bihêle, wê rewşa Sûriyê ber bi ku ve biçe?**

Belê; Eger Hikumeta Veguhêz di va siyaset û rewşa xwe ya heyî de dom bike û li xwesteka van pêkhateyan venegere, tekez wê ber bi perçebûn û şerekî navxweyî ve biherike. Şerê Sûnî, Elewî û Şîa her wiha di navbera Kurd û Suniyan de wê pêk were. Niha ev gel li ser burkanekê jiyan dike ka wê kengî ev burkan biteqe ne diyar e. Ji bo çareserkirin û xwe guhertinê divê hikumeta veguhêz demildest destûra xwe ya heyî biguherîne. Ger destur nede guhertin ev gel tu carî van kiryaran qebûl nake, miletekî ku bi sed hezaran şehî, windahî û koçberî jiyankiriye da ku azadiyê bibîne. Mînak; Me gelê Kurd li hember hemû komên çete, cîhadîst û DAIŞ'ê şer kir û nêzî 15 hezaran şehîd û bi qasî wan birîndarî dan, ji ber Kurd wê qebûl nekin weke ku Şeri dixwaze jiyan bikin, û em ê qebûl nekin ku li gor siyaseta hegomoniyê çawa dixwaze jiyan bikin. Lê di heman demê de destê me yên aştiyê û lihevkirinê dirêje. Eger guh nedin daxwaz û nêrînên me yên ji bo çareseriyê ku em jî dixwazin bi dewletê re gavên demokratîk û yên ewlehiya mayînde biavêjin. Dema hikumeta veguhêz gunh neda nêrîn û daxwazên Kurd, Elewî, Durzî, xiristiyan û heta Suniyan; Ev hikumet nikare jiyan bike, tevî ku hemû dewletên cîhanê yên weke Emerîka, Birêtaniya, Îsrayîl..hwd li pişt wê jî bisekinin ema ev gel wê qebûl neke. Kurd wê careke din qebûl nekin vegerin 2011'an. Ev guhertin tenê bi guhertina destûrî, avakirina dewletekî nenavendî ku mafê hemû pêkhateyan bê parastin, dengê azadiyê û parastina mafan hebe. Wisa be hikumeta nû dikare di asta herêmî, navnetewî û navxweyî de bê qebûlkirin. qebûlkirina navxweyî gelek girîng e, 60 salî hikumeta Baas li ser desthilatdariyê bû, lê di navxweyî de nehatibû qebûlkirin ku tu carî ev gel jê nerazî bû û wa çû çopxaneya dîrokê, ger ev hikumeta jî wisa bike wê dawiya wê jî wiha be.

**Ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk û pirreng, ji gelên Sûriyê û civaka navneteweyî çi tê xwestin?**

Tişta ku ji gelê Sûriyê û civaka navnetewî tê xwestin ew e ku em bifirkin em ê çawa Sûriyê ji nû de avabikin e. Reseniya Kurd, Suryan, Ereb, Turkmen, Kildan, Xiristiyan û hew din li vir hebû û jiyankirine. Ji xêr û bêrên vî welatî xwarine, vexwarine û têra her kesî kiriye. Ger em vegerin dîroka Sûriyê Dolaba yekemîn li Til Xelef çê bû, Nota yekemîn di hundir Ogarêt li Rais El-Şemra çêbû. Cografiya Sûriyê cografiyeke şaristanî ye ku tê de şer jî bûye, aştî jî bûye, li hev kirine û jiyan jî kirine. Di vir de Mîtanî û Huriyan jiyankirin ku bi awayekî bê navendî jiyan afirandine.

Ez bang li hemû afrîner û xwedîderketinên li dîroka Sûriyê bi hemû netew û pêkhateyên wê dikim ku bi aqil bifikirin. Ger stratejiya me ne bi aqil, biratiya gelan û demokrasî be, em ê li hember lehiya hegomoniyê winda bikin, li hember itîfaqên ku tê kirin em ê winda bikin. stratejiya me jî divê projeya Neteweya Demokratîk pêk were, ji ber tenê vê projeyê hebûna mirovahiyê li hember zihniyeta hegomoniyê parastiye.

# ‘Çapemeniya hikumeta veguhêz dengê gelên Sûriyê temsîl nake’

Hevserokê Yekîtiya Ragihandina Azad (YRA) Idrîs Henan da zanîn ku hikumeta veguhêz a Sûriyê bi rêbaza ku kî rizgar dike, hikum dike zimanê çapemeniya xwe li Sûriyê bikartîn e.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**



Di cîhanê gîştî de xeta raghandinê xeta çaremîn e. Raghandin ji bo pêşkêşkirina dengê rastiyê, helwest, êş, zor, zehmetî, tundî û serkeftina gelan tê bikaranîn. Herwiha rastiya bûyeran ji raya gîştî re radighîne. Lê îro hikumeta veguhêz a Sûriyê çapemeniya xwe ji bo reşkirina QSD’ê, Rêveberiya Xweser û sorkirina di nava gel û pêkhateya Sûriyê de bikar tîne.

Derbarê zimanê çapemeniya hikumeta veguhêz a Sûriyê Hevserokê Yekîtiya Raghandina Azad (YRA) Idrîs Henan ji Rojnameya me re axivî.

## ‘Di çapemeniyê de sûc û komkujî tên nixmandin’

Idrîz Henan diyar kir ku zimanê çapemeniya hikumeta veguhêz bikartîne, ne li gorî berjewendiya gelên Sûriyê ye, lê belê ji bo pêkanîna armancêm xwe ne û wiha got: “Hikumeta veguhêz a Sûriyê ji bo bighêje armanca xwe di zimanê çapameniyê de her rêbazî ji xwe rawa dibîne. Herwiha bi hatina wan li ser desthilatdariyê heman hişmendiya Rêjîma Baas ya ku kî rizgar dike, hikum dike wisa xwe didin tekezkirin. Dixwazin bi rêya çapemeniyê kiryar û sûcên ku dikin li ser binixmînin û tevgera hikumeta xwe erênî derxînin pêşberî cîhanê.

Li hemberî desthilatdariya hikumeta veguhêz a Sûriyê, projeya Netewa Demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê derket pêş ku ne şawaza desthilatdariyê, lê şêwaza xwe birêvebirineke demokratîk ku hemû pêkhateyan di nava xwe digirin, para herkesî, her gelî, her olî tê de heye û cihê xwe tê de digirin, temsîl dike. Lê belê hikumeta veguhêz a Sûriyê ev proje ji bo xwe projeyeke têkbirinê dît. Nikare li hember vê projeya Netewa Demokratîk gavekî erênî bavêje, li hember wê rêbazê reşkirina QSD’ê û Rêveberiya Xweser bikar anîn. Herwiha di vê çarçoveyê de ji bo vê projeyê vala derxîne rêbaza sorkirinê di nava pêkhateyên Sûriyê de bikar tînin.”

## ‘Zimanê çapemeniya hikumeta veguhêz zimanê nefretê ye’

Henan destnîşan kir ku zimanê ku çapemeniya hikumeta veguhêz a Sûriyê bikar tîne zimanê sorkirinê ye û wiha pê de çû: “Zimanê çapemeniya hikumeta veguhêz zimanê kîn û nefretê ye. Di çapemeniya xwe de rêbaza sorkirina di nava gel, netew û pêkhateyên Sûriyê de çêdike. Raghandina ku di bin sîwana hikumeta veguhêz de tê birêxistinkirin serpereştiya wê li gorî perspektîfa ku siyaseta weşana wan tê diyarkirin. Ev şer bi serwerî û siyaseta dewleta Tirk tê meşandin. Di heman demê de komkujî, kiryar, revadin û kuştina ku li herêmên di bin serweriya hukumeta veguhêz a Sûriyê de diniximînin û înkara wan dikin. Herwiha xwe bê sûc derdixînin pêş. Hikumeta veguhêz a Sûriyê li ser esasê zor û şidetê hewil dide ku xwe mayînde bike. Zimanê xapandinê di çapemeniya xwe de bikar tîne ji bo berjewendî û hebûna xwe misoger bike, herwiha ji bo sûc û nerazîbûna gel veşerê zimanek xapandinê û şerê taybet bikar tîne.”

## ‘Yekîtiya Raghandina Azad deng û rengê tevahî gelan e’

Hevserokê Yekîtiya Raghandina Azad (YRA) Idrîs Henan axaftina xwe wiha bi dawî kir û got: “Em weke Yekîtiya Raghandina Azad ji bo neqebûlkirin û redkirina zimanê çapemeniya ku hikumeta vehuhêz a Sûriyê li dijî Rêveberiya Xweser û QSD’ê bikar tîne, herwiha ji bo axaftina kînê û sorkirinê di nava pêkhateyan de em bi rêya daxiyaniyan helwest û bertekên xwe nîşan didin. Li gorî vê jî em weke çapemeniya azad dibin deng û rengê rastiyê. Herwiha rastiya bûyeran derdixînin pêşberî raya gîştî û dibin dengê tevahî gel, netew û pêkhateyên Sûriyê.”

# Muxeteb derket!



**Ahmet Aktaş**

Piştî 50’î salî, ‘mala xwedê ava be’, li himber Rêber APO guhdarek/muxetebek fermî, ji aliyê Dewleta Tirk ve derket holê.
Di 24’ê Mijdara 2025an de, şandeyek 3 kesî, ji Komisyona Pêvajoyê ya ku ji aliyê Meclisa Mezina Miletê Tirkiyê(TBMM) ve, ji bo çareseriya pirsgrêka Kurd hatibû damezrandin, çû seredana Rêber APO.
Ev şande, (ji her partiyê 1) ji endamên Partiya DEMê, AKPê û MHPê ve pêkhat.
AKP û MHP, partiyên Hevbendiya Cumhur ên desthilatiyê ne. Ji bilî DEMê ti partiyên dijber(mixalif) endam nedan şandeyê.
Heta demjimêren dawî jî, bendewarî hebû ku wê CHPê, endamekî bide şandeyê, lê nedan.
Hema li pey wan Koma YENI YOL ku ji PARTIYA SAADET-DEVA-GELECEK pêktê jî, endam nedan şandeyê.
Lê, van partiyên ku endam nedan şandayê, wisa diyar kirin ku wê xwe paşve nekişînin ji Komisyona Pêvajoyê.
Li ser biryara nexêrê ya CHPê tê gotin: Biryarek gelek şaş dan û wê ji vê biryara xwe gelek ziyanê bibîne, hema yekser wê ji wê asta Partiya Yekê werin xwarê, jiber ku bi giranî Kurd û dostên Kurdan, wê dengên xwe yên danê CHPê, bi paşve bikişînin û hwd!
Li aliyê din, ew rexneyên ku li Partiya DEMê dikirin û digotin, “DEM Partî, hat lîstoka Receb Erdogan û wê wî bikin Serokkomar”, lê mixabin vê carê ew bixwe ketin kemîna Receb Erdogan, bi vê hilwesta neyînî wan xizmetek mezîn pêşkêşî AKPê kirin û ew hatin xapandin, ne Partiya DEM ê!
Partiya DEMê, li ser rêya xwe RÊYA SISYAN dimeşin û wê her wisa jî dewam bikin.
Em vegerin ser encam û şîroveya şandina vê Şandeyê.
Hema di serî de mirov dikare bêje “ev pêngavek pir giring e, dîrokî û hêja ye”, jiber cara yekê ye ku di siyaseta dewletê de li ser doza Kurdan, di asta herî bilind de weke muxeteb û fermî gavek hatiye avêtin.
Jixwe Rêber APO, ji mêjve digot; “ez li muxetebekî digerim”, hat dîtin.
Ev, ne komite an komisyonek ji rêzê ye, belê ji aliyê sazûmana herî bilind a afrênera siyaseta dewletê Parlemenê hatiye damezrandin û serokatiya wê jî, Serokê Parlemenê Numan Kurtulmuş dike.
Her wiha ji bilî çend partiyên biçîk ên nijadperest, hemû partiyên desthilatê û partiyên dijber(ên opozisyonê) beşdarî vê Komisyona Pêvajoyê bûne.
Di vê pêvajoyê de, dibe ku mijara herî giring jî ev be: Yê ev pêvajo dane despêkirin û di meşandina wê de jî pêşkêşiyê dikin, dû hêzên sereke yên ev şerê pêncî salî didin meşandin Rêberê Damezrêner ê PKKê Abdullah Ocalan e û Serokê MHPê Devlet Bahçelî ye.
Hema mirov kurt kurmancî dikarê bêje, êdî ev pêvajo, ji qonaxa yekê derbasî qonaxa duda bûye û êdî ne bi tinê rewa ye, belê him rewa ye(meşrû ye) him fermî ye.
Em careke din sedemê wê dubarê bikin; him aliyên sereke yên vê pêvajoyê li hev kirine, him ji aliyê saziya herî bilind a dewletê ve hatiye pejirandin û erê kirin.
Êdî hêz an kesên bixwazin vê pêngavê hilweşînin an proveke bikin, dibe ku ew bi xwe hilweşin.
Lewma divê her alî êdî lingê xwe bi pîvan bavêjin!

# Yan bêdengbûn yan gule di sîngan de

**Hemza Sêvo**

Di 23’ê Mijdarê de hêzên HTŞa hikumeta veguhêz li Humsê êrişek li dijî welatiyan kir, welatiyên pêkhateya Elewî bûn. Ev êriş di çarçoveya şerê mezhebî û olperestî li taxên wekî Muhacirîn û Basil pêk hat. HTŞ kiriyarên terorîzmê li ser Elewiyan da meşandin, malên sivîlan şewitand û firoşgeh talan kirin. Ev êriş bi hevkariya Hoza Benî Xalid pêk hat, piştî tevlîheviya destpêkê bi çend seetan, ev hoz dest bi barandina guleyan kir, agirê tevlîheviyê geş tir kir. Lewma serkêşê rûhanî yê Elewiyan û serokê Meclisa Bilind a Îslamî ya Elewiyên li Sûriye û Dîasporayê şêx Xezal Xezal li dijî binpêkirinên ku li ser Elewiyan tên kirin, banga xwepêşandanan kir. Bê guman ev xwepêşandan û nerazîbûn aştiyane hatin meşandin û yên ku derketibûn li qadan sivîl bûn. Li Berava Sûriyeyê hişyariyeke ewlehiyê û seferberiyek heye di demên dawî de. Li Hemayê û deverên Selheb, Dêr Şimêl, Nehr El Barid û Siqiliyayê bend hatine danîn û hêzên leşkerî lê hatine belavkirin. Ev yek tekez dike ku hikumeta Colanî bi tu rengan sivîl dernekevin xwepêşandan û dengê sivîlan bi taybet ê Elewiyan were fetisandin, eger bi çekan mabe jî wê Colanî biryarê bide da ku gel bêdeng bike, desthilata xwe û rewşa heyî li ser Elewiyan bide qebûlkirin. Lewma me di 25’ê Mijdarê de dît dema ku gel ji bo doza pêkanîna aramiyê û rawestandina kiriyaran, hem jî pêkanîna welatekî demokratîk kirin, tivingên Colanî ketin sîngên xwepêşanderan. Di vê bûyerê de, tiştek tenê bala min kişand, destpêka aloziya Sûriyê û şoreşa ku gelên Sûriyê ji bo azadiya xwe li dijî rêjîma Baas derketin pêşandanan, hat bîra me. Rêjîma Baas jî sîstemeke bi vî rengî dida meşandin da ku erşê hukmê xwe bidomîne. Di 15’ê Adarê xwepêşandana yekem ji aliyê çalakvanên civaka sivîl ve li Bazara Elhimêdiye li paytexta Şamê hate destpêkirin, ev gav bû şahidê destpêkirina kirîza Sûriyê. Xwepêşanderan dirûşmên ku banga azadiyê dikin, di nav de ‘Xweda, Sûriye azadî û bes’ berz kirin. Hikumeta Şamê jî ji aliyê xwe ve êrişî xwepêşandanê kir, ew kesên xwepêşindander belav kirin û hejmarek ji çalakvanên beşdar dan girtin. Malperên mediyaya civakî yên ku piştgirî didan serhildanên gel, di roja Înê de ya ku diket 18’ê Adara 2011’an, di bin navê ‘Îna Rûmetê’ de bang ji bo destpêkirina xwepêşandanên girseyî li hemû bajarên Sûriyê kirin. Xwenîşandana li Deraa bi girseyî bû û welatiyên ku doza azadiyê û qewrandina rêjîma Baas dikirin ji hêla leşkerên hikumetê ve bi guleyan hatin hedefgirtin. Piştî wê jî bi hezaran gelên Sûrî li tevahiya Sûriyê rabûn xwepêşandana û hikumeta Şamê jî bi firokên leşkerî û hemû cureyên çekên giran bersiva gel dida. Bi dirêjahiya hukmê Baas ev siyaset li hemberî her aliyekî ku doza mafê xwe bike, dihat meşandin. Siyaseta ‘Yan tu yê bêdeng bimînî, yan jî eger tu derketî xwepêşandanan, wê gule di eniya te de be’ siyaseteke bi vî rengî bû. Bi dirêjahiya hukimê Baas û kirîza Sûriyê jî ev yek dihat pêkanîn. Eger em bala xwe bidin siloganên aliyên siyasî di xwepêşandanan de û roja ‘Înê’ Weke roja Îna Rûmetê, silogana Xwedê mezin e, em ê bibînin ku çêja islama siyasî û radîkal derdikete pêş. Aliyên siyasî doza gelên Sûriyê vediguherandin û ji cewherê wê derdixistin, gelo xwepêşander tev mislman bûn, ên ku li dijî Essed bi tevahî muslman bûn? Doza siyasî ya hêzên islamî wiha hat meşandin heya ku rêjîm têkçû, piştî rûxandina Beşar Elesed êdî system neguherî, serokkomar tenê guherî û li şûna sîstemeke navendî ya ilmanî, sîstemeke navendî ya radîkal a islamî cihê xwe girt. Êdî di bin silogan û xîtaba kîn û nefretê kiriyarên HTŞ’ê de li dijî Elewiyan û Durziya, herwiha pêkhateyên Sûriyê weke miletê Kurd, gurtir bû. Tişata ku di dawiyê de bû, di hemwextiya bihêzbûna Rûsyayê li Berava Sûriyê de ne ji berjewendiya hikumeta HTŞ’ê ye ku bibe û hewldanên parçebûna Sûriyê çêbibe. Ev hemû kiriyar di bin navê Islamê de ji hêla hikumeta HTŞ’ê ve tên kirin, ji bo kûrkirina kirîza Sûriyê û parçekirina wê ne. Li vir mirov dihizire! Û dibêje gelo hêzên ku Colanî danîn ser desthilatdariya Şamê ji bo parçekirina Sûriyê ew ji nav kefên terorê anîn, yan ji bo berjewendiyên wan? Tekez ji bo berjewendiyên Israîl, Amrîka, dewleta Tirk û dewletên Ereban ev guhertin çêbû. Lê çareseriya li gorî dilê gelên Sûriyê û hêviya wan, ne bi Amerîka, Israîl û ne jî dewleta Tirk a dagirker pêktê. Çareserî di pêkanîna sîstema Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ye, ev mînak jî ji bo tevahiya Sûriyê û dewletên Rojhilata Navîn guncav e.



# Komînên çalak û birêxistinkirî; navendên çareseriyê ne

Komîn nirxên civakî bi awayekî herî sade û azad tîne jiyîn û diparêze, herwiha Komîn li derveyî dewletê ye, lê dewleta ku li dora 5 hezar B.Z. dest bi dagirkirina jiyana mirovan kir, armanc kir ku hebûna komînê ji holê rake. Lê Komîn civakên birêxistinkirî û demokratîk ava dikin û pêşketina civakê bi pêşkeftina komînê ve girêdayî ye.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Mirovahî di dîrokê de bi rêxistinkirina Komûnan jiyaye. Avabûna mirovahiya yekem an jî civaka yekem, li dora Komûnan şekil girt. Yekîtiya Komûnal wekî rêya herî baş derket holê ji bo dabînkirina pêdiviyên wan û misogerkirina ewlehiya wan, da ku bijîn. Ji ber mirov ne ewqas bihêz in ku di xwezayê de bi tena serê xwe bijîn. Ji ber vê yekê wan ji bo telafîkirina qelsiyên xwe serî li civakê dan.

## Wateya Komûnê

Peyva “komûn” ji peyva “kom” tê ku tê wateya civak û bi hevrebûnê. Ew jiyaneke hevpar e ku mirov lê dicivin û armanceke hevpar ava dikin. Herwiha Komûn rola parastina hev, xwe birêvebirin û çareserkirina pirsgirêkên jiyanê û pirsgirêkên di civakên xwe yên herêmî de jî dilîze. Ew di heman demê de şêweya jiyanê ya herî watedar e ku tê de hestên hevpar serdest in û hest û bertekên hevpar li hember pirsgirêk û êrişan derdikevin holê. Bi gotineke din, Komûna ne tenê mekanîzmayeke parastinê li dijî êrîş û zordariyê ye, di heman demê de deriyê rastîn ê jiyaneke xweşik û watedar e.

Komûn wekî kevintirîn û bingehîntirîn şêweya civakîbûna mirovan tê pênasekirin. Civakên eşîrî yên kevnar, bi taybetî civakên dayiksalarî, şêwazek jiyana Komûnal temsîl dikin. Ev civakbûn bi qasî 30 hezar salan pêş ket û dom kir. Rastiya ku peyva “komûn” ji peyva Kurdî “kom” (berhevkirin) tê, girêdana wê bi bilindbûna çandî ya vê civakîbûnê li Mezopotamyayê nîşan dide.

## Nirxên komînal hebûna mirovahiyê berdewam dikin

Di seranserê dîrokê de mirovahî di komînan de jiyaye, lê hevdîtina wê bi pergala dewletê re vedigere şeş hezar salan. Dewlet ku li dora 5 hezar B.Z. dest bi dagirkirina jiyana mirovan kir, armanc kir ku hebûna komînê ji holê rake. Komîn forma herî kombûyî ya civakîbûna mirovan, ji ber ku nirxên civakî dihewîne, gef li hebûna dewletê dixwar. Her çend dewlet aîdî hindikahiyek xweperest e ku li ser bingeha desteserkirinê ye jî, komîn hebûnek parveker e ku hemû endamên civakê dengek wan heye û berjewendiyên civakî yên kesên azad diparêze. Nakokî û pevçûna di navbera van her du hêzên dijber de di pênc-şeş hezar salên dawî de berdewam kiriye. Her çend hebûna nirxên komînê ku bi hezaran salan di bin êrişê de ne, ji holê nayên rakirin jî. Ji ber di bin êrişên sîstematîk a ji pergala hiyerarşîk de, nirxên komînal di civakê de wekî hewcehiyek ji bo hebûna mirovahiyê berdewam dikin.

## Komûn li gorî ravekirina Rêber Apo

Rêber Apo Komûnê wiha rave dike: “Bi Komûnê, mebesta me komên mirovan e ku di hemû warên civakê de çalak in. Ji ber vê yekê, divê her gund li gorî şert û mercên heyî Komûnek hebe; an Komûnek e an jî komek e. Ev dikare li taxan an bajaran belav bibe. Kooperatîfek, kargehek, komeleyek an rêxistinek civaka sivîl jî dikare Komûn be. Divê demokrasiya wê jî hebe, ji ber vê yekê dikare wekî pergala Komûnal a demokratîk were binavkirin. Ew dikare di hemû warên jiyanê de, wekî perwerde, çand, huner û zanistê jî were damezrandin. Demokratîkkirina jiyana civakî û siyasî jî dikare Komûnal be.”

## Bingeha komûnekê di têgeha azadiyê de ye

Azadî wekî jiyaneke ku li dora nirxên civakî yên exlaqî û polîtîk hatiye avakirin, ji her serdestiyekê azad e, tê fêmkirin. Nirxên exlaqî pabendbûna bi prensîb û zagonên azadiyê di nav civakê de nîşan didin. Bi vê pabendbûnê kesên ku di çêkirina polîtîkayê de dixebitin bersiva pêdiviyên civakê didin. Çalakiya kesên ku di komûnekê de beşdar in pir girîng e. Di dawiyê de, armanc çareserkirina pirsgirêkan û pêşkeftin e. Ji ber vê yekê pêşveçûn bi çalakiya di çêkirina polîtîkayê û rêveberiya karsaziyê de tê pêşve xistin.

## Komûnên heyî ji ber xwezaya xwe ya kevneşopî têne parastin

Komûn her çend kêm bin jî, hîn jî li gundên Kurdistanê hene. Lê belê Komûnanên heyî ji ber ku bûne kevneşopî berdewam dikin. Wan ji demên berê heta niha di jiyana me ya civakî de, cîhek girtine. Komûnên heyî ji ber xwezaya xwe ya kevneşopî têne parastin. Lê belê ev Komûnan çiqas hişmendiya neteweyî, siyaset, rêxistin û zanistê dihewînin, mijara nîqaşê ye.




## Pêşketina civakê bi pêşkeftina komînê ve girêdayî ye

Komûnek ku li ser nirxên civakî, bi taybetî parvekirin û bi hev re bûnê hatiye damezrandin, nirxên exlaqî û siyasî yên ku ji bo hebûna civakî girîng in, diparêze. Parastina van nirxan tê wateya parastina nirxên civakî. Ji bo ku kesek di nav civakê de bijî, pêdivî ye ku li gorî prensîb û pîvanên ku ji hêla civakê ve pêwîst têne dîtin, bijî. Her ku ferd bêtir bi civakê ve girêdayî dibin, hesta berpirsiyariyê û hişmendiya wan di nav civakê de zêde dibe. Pêşxistina vê hesta berpirsiyariyê dihêle ku ferd bi awayekî giştî pêş bikeve. Hebûn û xwezaya komînê berhevoka hewildanên ferdan e. Her ku ferd bêtir hewl bidin û bixebitin, komîn ew qas pêş dikeve û pêşkeftina civakê bi pêşkeftina komînê ve girêdayî ye.

## Komûn li derveyî dewletê ye

Komîn xwedî pileya herî bilind a cihêrengiyê ye û ji bo qadên jiyanê bi gelemperî bingehîn e. Şêweya ku hemû nirxên civakî bi awayekî herî xurt tên jiyîn, di rêxistina Komûnan de tê dîtin. Qalîteya Komûnan qalîteya nirxên civakî nîşan dide. Civak ji Komûnan pêk tê û ew nirxên civakî bi awayekî herî sade û azad têne jiyîn. Ji ber Komûn li derveyî dewletê ne. Ev taybetmendiya wan a herî girîng e. Parastin û pêşxistina nirxên civakî bi mayîna li derveyî dewletê mimkun e. Yekîneyên rêxistinî yên civakî yên ku ne beşek ji dewletê ne, ne di bin destwerdana derveyî de ne. Ev serxwebûna rastîn e. Xwedîbûna dewletekê an jî beşek ji wê ne serxwebûn e. Yek ji derewên herî mezin ên ku di dîrokê de ji mirovahiyê re hatine gotin, çîroka serxwebûna dewletê ye. Li ser rûyê erdê tu dewletek serbixwe nîne. Hemû dewlet di nav sîstema sermayeya gerdûnî de hatine organîzekirin û divê li gorî berjewendiyên vê pergalê tevbigerin. Li derveyî dewletê mayîn di heman demê de tê wateya li derveyî sermayeya gerdûnî mayînê. Ev yek hemû astengiyên li pêşiya exlaq û siyaseta civakî ji holê radike.

## Ger komûn bihêz bin, civak jî xurttir dibe

Komîn ku bi helwestên hişmend û rêxistinkirî hatine avakirin û pêşxistin, yekîneyên herî piçûk ên civakê ne. Kalîteya van yekîneyan asta civakê diyar dike. Ger komûn bihêz bin, civak jî xurttir dibe. Civatek bihêz hem li hember êrişên derve berxwedêr e û hem jî astengker e. Li hember hemû êrişên dewletê an jî her avahiyek din a desthilatdariyê avahiya herî rêxistinkirî ava dike. Ji ber vê yekê, hişmendiya wê ya parastinê û îradeya wê bilind e. Civakek belavbûyî qels û bêparastin e. Lêbelê, civakek yekgirtî û rêxistinkirî zirarê li hember êrişan kêm dike.

## Komîn dê bibin navenda çareserkirina pirsgirêkan

Wekî gelekî ku tîbûna azadiyê heye, Kurd ji nan û avê bêtir hewceyê avakirina komînê ne. Ji ber vê yekê divê hemû hewldan çarçoveya komînê zêde û kûrtir bikin. Komûnalîte jiyana hevpar nîşan dide û komîn form û formata vê jiyanê ye. Ew şêwazek jiyanê ye ku civak bi dilxwazî di hundurê xwe de dijî û rêxistin dike, nirxên demokratîk û exlaqî bêyî ku li ser dewletê be an jî girêdayî wê be, vedihewîne. Her komînek ku di çarçoveya hemû taybetmendiyên civakî yên hêja û erênî de pêş dikeve, dê başiya civakê bide pêşiyê û komîn dê bibin navenda çareserkirina pirsgirêkan. Ew di heman demê de rêya xilasbûnê ji kontrola hêzên serdest e ku bi hezaran salan civakê bindest kirine.

## Dewlet koletî bi xwe re anî

Ji bilî komînan, rêyek din ji bo avakirina civakek demokratîk tune. Eger rizgarî û demokratîkbûn tê xwestin, avakirina komînan rasterast li ser bingeha rêxistina gel girîng e. Di dîrokê de, “avakirina dewletê” ku wekî amûrek rizgariyê tê dîtin, ji bilî koletiyê tiştekî din nayne.

## Aboriya komînal

Di seranserê dîrokê de, aborî her tim bi rêbazên Komûnal hatiye birêvebirin. Aboriyek bê Komûnal bêwate ye. Ji rojên xwe yên destpêkê heta îro, civak bi rêbazên Komûnal, bi hevkarî û parvekirinê pêdiviyên xwe bi cih aniye. Lê tiştê ku kapîtalîzm îro wekî aboriyek pêşkêş dike, di rastiyê de desteserkirina aboriyê ye. Ji ber kapîtalîzm yekdestiye ku ne aborî ye, serdestiya bazarê ji bo qezencê ye. Herwiha serdestiya li ser aboriyê tê wateya hilweşandin û wêrankirina Komûnan ku civak ji bo peydakirina pêdiviyên xwe serî li wan dide. Ger civak bixwaze bijî û hebûna xwe biparêze, divê ew li ser bingeha aboriya Komûnal be.

## Komîn civakên birêxistinkirî û demokratîk ava dikin

Li ser vê bingehê da ku komîn li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bêh çalakirin, roja şemiyê bûye roja komînan taybet, ev nayê wê wateyê ku rojên din jî komîn girtîn e. Lê di vê rojê de xebatkarên Rêveberiya Xweser diçin komînan û xebatê li wir didin meşandin. Armanca wê ew e ku komîn li gorî pênase û wateya xwe di nava civakê de cih bigre. Ji ber ku çareseriyên civakê çi kesayetî, çi malbatî û çi jî giştî be di rêya komînan de dikare were çareserkirin. Di heman demê de dema mefhûmê komînan were rûniştandin dê bi xwe re civakeke rêxistinkirî û demokratîk ava bike.